

Sal:2 Hejmar:53 21-27 Sibat 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Qumandarê Herêma
Çaremin a Eyaleta Mêrdinê

Xwestinê dijmin berevajî bikin


Rûpel 6



Di salekê de 14 rojnameyan hatin kuştin û qatilê tu yekî nehate girtin.

Herkes qatil dizane

✓ Nûnerê rojnameya Özgür Gündem ê Ruhayê û muxabîrê rojnameya Yenî Ülke Kemal Kılıç, li gundê Ruha, Kuluncê ji alî kontrayan ve hate kuştin. Bi kuştina Kemal Kılıç re, hejmara şehîdên Özgür Gündemê gihişte 8'an. Ew dewleta ku di kuştina Uğur Mumcu de, gîrsen gel bi sloganê demokrasiyê dida meşandin, ji cenazê Kemal Kılıç tîrsiya û ji morga Ruhayê revand. Rêveberiya herdu rojnameyan, HEP û Komeleya Mafêni Mirovan, dibêjin ku em qatil dinasin.



✓ Di pêvajoya salekê de nêzîkî 10 rojnameyanê Kurd ji rojnameya Gündem, Yenî Ülke û Welat hatin qetikirin. Ji bo veşartina qatilan dewleta Tirk gotina "faîlî mechûl" avete holê, ji bo ku rûyê xwe yê qirêj veşêre. Lî êdî tu kes bi gotina "faîlî mechûl" nayê xapandin. Hemû kes baş dizane ku ev qetîfam bi destê dewletê bi xwe tê kirin. Ji ber vê yekê qatilên mechûl tunin; qatil dewleta Tirk a xwînmij û dagirker bi xwe ye.

Rûpel 8

Polîs nobetê digire hizb-î kontra dikuje

✓ Êrîş û cinayetên hizb-î kontra bi destek û rênîşandanen dewletê ve didomin. Di kuştina welat-parêzan de, hêzên dewletê bi awayekî vekirî cih digirin. Cihênu ku lê êrîşen kontrayan pêk tê, pêşî ji alî hêzên dewletê yên fermî ve têne dorpêçkirin ku, êrîşkar bi hêsanî dikaribin êrîş bikin û birevin.

Rûpel 9

Agir ji devê İsmet Sezgîn dibare

'Em bixwazin emê Kurdan tev de bikujin'

✓ İsmet Sezgîn li Diyarbekirê ev mesaj da û bi helyeta Alman re gundê hizb-î kontra Sûsa û Garisiyajorîn ziyaret kir. Partî û sazgehê demokratik mesaja Sezgîn protesto kirin.

Rûpel 5



Gelê Kurd ci bajarı, ci jî gundi tev bi têkoşîna azadiyê re diguherin. Herwiha iro gundi jî tariyê dicirînin.



Seîdê
İbo

R. Cizre



Grev bi
serfirazî
qediya

Rûpel 4



Bi Eyşe
Şan re
hevpeyvîn

Rûpel 16

REWS



Abdullah Keskin

Nirxandina salekê

Welat gihîste hejmara 53'yan. Ev hejmara di destê we de hejmara sala duduyan a yekemîn e. Ji bo weşaneke Kurdî di wext de derketin girîng e. Welat bi periyordê hefteyî ev salek e her hefta di wextê xwe de derdikeye û belav dibe.

Me dixwest di vê hejmara de guherînan çêbikin, rûpelan zêde û rengîn bikin. Lê di sertê ûro de ev ne mumkûn e. Karê rojnamê ji sedî pêncî jî, belavkirin û firotin e. Wek hûn dizanin ji vê hejmara û pê ve şirketa belavkirinê êdî Welat belav nake. Hefteya derbas bûyî polisan buroya me û Yenî Ülke tarûmar kîrin. Her roj hevalekî me an tê girtin an ji kuştin. Di nirxandinekê de gerek e mirov van şertan bide berçav.

Di salvegerê de em dixwazin muhasebe-yekê bikin. Welat ci kir, ci nekir, gerek ci bikira û hwd... Gotineke pêsiya heye, dibêjin: "Tu kes nabêje dewê me tirş e." Lê mirovên ji bo mirovahiyê bi dil û can di şer de ne divê kîmasî û qelsiyên xwe bibînin. Emê ji di vê nivîse de bi giştî li ser kîmasiyan û sebebêwan bisekinin. Tiştin ji hene ji bêeleqetiyê nayê dîtin. Em dixwazin van ji bi bîr bînin.

Ji bo rojnameyeke xwerû bi Kurdî pirsîrêka herî mezîn ziman e. Pêşî ezê li ser zîmîn bisekinim.

ZIMANÊ WELAT

Bi rastî wexta ne bi hîseke romantîk bi awireke zanyarî û objektîv li diroka welat û civaka xwe binêre mirov wê bibîne ku Kurdî di zîmânî nivîskî de zêde nehatiya bikaranîn. Zîmanê Kurdan ev ne 70 sal e, ev 700 sal e qedexekirî ye. Ûro li bajarekî wek Konya 20 radyo hene. Lê hê ji li weletê me radyoyeke bi zîmanê me nîn e.

Însanîn me ji alfabeyle re biyanî ne. Nivîseke Kurdî nû dibînin. Jîxwe xwendîn û nivîsandîn di civaka me de kêm e. Li ailiyê din tesîra zarave û devokan heye.

Zîmanê rojnameyekê divê standart be. Sê-çar devok di rojnameyekê de çêna-bin. Divê zîmanê rojnameyê zelal be. Em di serî de ji di vê baweriyê de bûn. Lê demeke dirêj zîmanê me giran bû, bi giştî ji zîmanê xeberan. Ji ber ku bingeha xeberan çênebûye. Em dinêrin rojnameya ên Kurdî kevn-nû, heta niha xeber bi Tirkî, Erebî... çap kirine. Di xeberan de hin biwêj û term hene. Hûn nikarin van bi Tirkî binivîsinin di rojnameyekê Kurdî de. Hûn mecbûr dimînin Kurdiya wan bibînin, çêbikin. Çekirina terman û peyvîn nû ne karê rojnameyê ye. Gerek e akademî û sazgehîn neteweyî vî karî bi cih bînin.

Mixabin ûro tu xebatêni bi vî rengî nîn in. Èn hene ji bersiva demê nadîn.

Peyvek an termek ku di zîmân de rûnenîşti be em bi kar nayîn. Heta niha gelek peyv û term me guhertine, şekleki wan û rasttir bi kar anîye. Ez dikarim vê bibêjîm ku, her hejmarê wê zîmanê me hêsanter û baştir dibe. Wê hê ji zelal û baş bibe.

SORANÎ Û ZAZAKÎ

Em dizanin heta niha nivîsîn bi zara-yen Soranî û Zazakî derketin li gora Kurmancî gelekî kêm in. Ev nayê wê maneyê ku em li dijî van zaravayan e. Em naxwazin Soranî û Zazakî ihmâl bikin. Di nav xebatkarêni me de yên ku bi Soranî dizanin nîn in. Hevaleke me ji Zazakiya xwe bi pêş xist. Di vî alî de hin zehmetî hene. Di demeke kin de ev pirsgirêk jî wê hal bibe.

FORM Û MÎZANPAJ

Hin xwendevanêni me, bi giştî ji yên derve forma Welat biçûk dibînin. Dibêjin



gerek e Welat 3-4 santîm dirêjtir û santîmek du santîm ji firehtir bibe. Bi rastî em ji vê formê baştir dibînin û dixwazin. Lê ev form, jê re dibêjin formê Berlînê, li çapxaneyê Tirkîyê nîn e.

Şekl û naverok bi hev ve girêdayî ye. Divê mîzanpaja (rûpelraxistin) rojnameyekê ji li gor form û naveroka wê be. İmkânî teknikî ji gelekî tesîrî li mîzanpajê dîkin.

Welat mîzanpaja tu rojname û kovaran teqlid nekir. Li gor ımkân û kadroyen xwe mîzanpaja xwe çedike. Tiprêzî, mîzanpaj, film û montaja Welat li buroya me amade dibe. Tiprêzvanêni me li gor Kurdî xwe gihadîn. Kîmasî hebin ji girîng e ku em bi xwe hertişte rojnameyê amade dîkin.

ROJNAMEYEKE KURDISTANI

Dagîkerêni ku Kurdistan di nav xwe de par kirine ji, êdî dibêjin û dibînin sînorêni ku Kurd ji hevîdu vegetandine sunî ne. Weşaneke Kurdan gerek e tu itîbarê ne-de van sînorêni sunî. Rojeva xwe li gor rojeva gelê Kurd û her parçeyen Kurdistanê belî bike. Em her tim di vê baweriyê de bûn. Heçî karakterê van dewletê dagîker dibîne wê zanibe ku ev ne tiştekî hêsan e. Hê ji em tam nikarin bi serbestî rojnameya xwe li nav Kurden Sûri, Başûr û Iranê belav bikin. Gelek astengiyan derdixin. Heta li Bakur ji belav nabe.

Ji her deveren ku Kurd lê dijîn, nivîs ji

me re tê. Devera ku Kurd lê hebin Welat kêm-zêde digihije wir. Ji hemû parçeyan ji nivîskarêni me hene. R. Cizre, Dilbix-wîn, Konê Reş, Kamîran Haco, Amed, Abdulvehab Babî, Ehmed Şerîf, Prîskê Mîhoyî, Mehâbat Kurdi û gelek nivîskarêni me yên din ne ji Bakur in. Bi Kurden Nexîwanê, Rewanê, Ewrûpa.. re hevpeyvîn derketin. Xeber gelekî kêm in. Xebereke Dîhok an ji Efrînê li ser maseyê nayê nivîsandin. Li Başûr û Sûri fax ne mimkun e. Di demeke kurt de ev pirsgirêk jî wê hal bibe. Hevalen me li Yêrivanê buro ve-kirin. Li Sûri, Başûr û Mehâbadê ji em difikirin ku buroyekê vekin.

Di vî alî de daxwazeke me ji xwendevanêni me heye. Bûyeren dora xwe muheqqeq ji me re binivîsin. Mimkun be bi daxtilo binivîsin, bi destivîsi nayê xwendin. Bila nivîs kurt bin.

XEBER

Rojname bêxeber çênabe. Di rojnameyên Kurdî yê heta niha derketin de, xeber an kêm bûn an ji bi zîmanê biyanî bûn. Ji vê yekê ji bingeh û uslûba xeberan qels e. Her roj biwêj û termên nû derdikeyin. Wexta xeber bi Kurdî bin, zîman ji bi pêş dikeve. Ger em bi kar bînîn, Kurdî besî me ye. Gerek e tu kes Kurdî wek motifên folklorik bi kar neyne. Ma em ne ji bo kesayetî, welat, çand û zîmanê xwe têne kuştin? Ev têkoşin ji bo ci ye? Divê em ji pêşerojê re bingehêkê çêbikin. Em bi vê baweriyê hereket dîkin û rojnameyeke Kurdan a rojane bi Tirkî hebe û her roj xeberan bide ji emê dîsa xeberan bi Kurdî biweşînin. Ji bo rojnameyeke Kurdî ev

pêwist e.

Demekê di xeberen me de hin kîmasî û qelsî hebûn. Ev ji:

1. Xeber gelekî dirêj bûn.
2. Teknîka xeberan qels bû.
3. Zîman giran bû.

4. Wêneyêni xeberan her çaxî tune bûn. Heçî Welat ji serî de taqîb dike guherîni di xeberan de wê bibîne. Xeberen me ji wê ji vir û pê ve baştir bin.

WELAT DESTPÊK E

Dîroka rojnameyeke Kurdistani bi Welat dest pê nake. Berî me gelek kovar û rojname derketin. Em vê rastiyê dizanin. Lê rastiyêni din ji heye. Wexta me dest bi vî karî kir, xebateke ku em wek mînakêkî lê binêrin tune bû. Kîjan xeber bala xwendevanî dikişine, sernîvis çawa bin baş e, manşet çawa tê avêtin, di vî warî de mînak tune bûn. Ji vê yekê ji Welat destpêk e. Her tişte me li gor zanîn û nezanîya me ye.

Em karê xwe cidî dibînin û cidî digirin. Tu fêda me ya maddî ji vî karî nîn e. Li dijî hemû astengiyan emê vî karî bidomînin. Heta nefesa xwe ya dawî emê bidomînin.

Ji vê merhalê û pê ve ji, bar dikeve ser milê xwendevanî Kurdistani. Ji vê hefteyê pê ve emê bi destan rojnameya xwe belav bikin. Em bîmîzîni ku ewê çiqas li me, li rojnameya xwe xwedî derkevin.

Nîha evqas!

FERHENGOK

- Afirandî: Xulqûbûyî (yaratılmış)
- Bizav: Tevger, lebat
- Cihêring: Bi ferq (değişik)
- Cihêrengî: Ferq (değişiklik)
- Çewsandin: Tewandin
- Çandînî: Zireet
- Çin: Sınıf
- Çîna civakî: (Toplumsal sınıf)
- Diyarde: Hebûni, fenomen
- Gok: Top, topa futbolê
- Guftûgo: Munaqşe, genegî
- Gundor: Bangor, petêx, qawin
- Hemdem: Hemçax (çağdaş)
- Herêm: Minteqe (bölge)
- Hilberîn: İhtîsal (üretim)
- Hizirîn: Ramankirin (düsünmek)
- Kelk: Feyde, kar
- Kêferat: Hewlîan (uğraş)
- Lênerîna siftî: (Yogun bakım)
- Mêzin: Terezî, pivan
- Mijar: Dabaş, mewzû
- Pergal: Sazûman, sistem
- Peywir: Wezife (görev)
- Pest: Pêkutî, pêstûrî (baskı)
- Pût: Xwarina sewal û dewran(yem)
- Silk: Silq, pincara şeker
- Sûd: Kelk, feyde
- Şenî: Rûnişvan, nifûs
- Teşe: Dirûv, şekil, form
- Xemgîn: Bi xem, bi derd (üzgün)
- Xweza: Tebet (doğa)
- Xwezayî: Tebii (doğal)
- Vebjî: (anlatım)
- Vegotin: (anlatmak)
- Veguherîn: (dönüştür)
- Weşan: Neşriyat (yayın)

Salvegera Welat

Li te pîroz be salveger
Car din bi xêr hatî Welat
Weke durr û zér û zeber
Sorgula welatî Welat.

Berhemâ wêjeya zêrîn
Dermanê dilê bi birîn
Li ser bingehêke bi xwîn
Wek rojê hilatî Welat

Ji bo yekîtiya zîman,
Pêk tîne peywîrek giran
Diherike hemû deran
Dicle û Ferad û Welat

Ji bo Kurdan his û deng û
Li hember dijmin bi ceng û
Tu her bijî bi vî rengî
Tim bi kêferat û Welat

Ewêne dibêjin em Kurd in
Çawa wê dev ji te berdin?
Bixwînin û bidin xwendin
Da nemîne ketî Welat

Dev û guh û, çav û gav û
Heyv û roj û, şewq û tav û
Li hundirê cêr tu av û
Bê te dimînin tî Welat

Pirr girîng û ji bo Kurdan
Dengê leheng û egîdan
Ji gola xwîna şehîdan
Bo me tu xelatî Welat

Te dilşa kir Kalê Xanî
Bi rêz û rêç û ramanî
Delala Jîr Dilovan û
Şox û li hev hatî Welat

Jir Dilovan

Li gundê Xerarê qetlîam

Navenda Nûçeyan- Li çar a- liyên Kurdistanê ser di navbera gerîlayen ARGK'ê û hêzên dewletê de, didome. Li hin de- veran gerîla digire ser qerargeh û saziyên dewletê, li hin cihan hevkar û ajanêñ dewletê têñ cezakirin û li gelek deveran ji cerdevan û tîmêñ taybeti tadeyi didin gel.

GERÎLA ŞANTIYE ŞEWITAND

Li Melazgirê roja 11'ê Sibatê gerîlayen ARGK'ê girtin ser şantiya YSE'yê. Di vê êrişê de, du grayder, du dozer û Merse- desek şewitandin. Gerîlayan destê xwe nedan notirvanen (bekçiyen) şantiye û ji wir dûr bûn. Pişti vê livbaziyê polis ha- tin şûna bûyerê û ji notirvanan re gotin: "Hûn çima nehatine kuştin? Hûn ji wan in."

Li Melazgirê 15 kesen ku berî du hefteyan hatibûn girtin, roja 11'ê Sibatê hatin berdan.

Li Farqînê roja 14'ê Sibatê yek ji elemanê hizb-i kontra Abdulrezak Bozkurt, du kes hatin kuştin, navê yê din Şakir Yu- ce ye.

LI SERTÊ DU GERÎLA HATIN KUŞTIN

Roja 12'ê Sibatê li Sertê, li Taxa Bitimê, hêzên dewletê li ser ixbarêkê bi bombeyan girtin ser malekê. Di vê malê de du gerîlayen ARGK'ê Cemal (Ka- sim Tokgöz), Enwer (Selahattin Balta) û gundiyeñ bi wan re, hatin kuştin.

Xwediye malê Şêx İbrahim ji bi xedarı birîndar bû.



Leşkeran li Sisi (Yolçatı) pênc mal şewitandin.

LICE

Li Licê roja 12'ê Sibatê hêzên dewletê girtin ser gundê Sisi (Yolçatı) û pênc mal ji binî ve hilweşandin û şewitandin. Li gor nûçeyen gîhiştine me, leşkeran li vî gundi dest avêtin pîrekîn gundi û eşyayêñ nav malen gundiyan ji talankirine.

KERBORAN

Li Gundê Kerboran, Dey- ranê hêzên dewletê êrişek pêk anîn. Di vê êrişâ ku roja 15'ê Sibatê bi desteka helikopteran hate kirin de, 5 gundi hatin qe- tilkirin, 20 gundi ji hatin girtin. Cerdevanen herêmê ji besdarê vê êrişê bûn.

DÊRIK

Li aliye din di 17'ê Sibatê de Komeleya Mafen Mirovan a Amedê, li ser 8 kesen ku roja 16'ê Sibatê li Dêrikê hatibûn kuştin daxuyaniyek da çapeme-

niyê. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin. "Ev 8 kesen ku hatibûn kuştin û ji aliye dewletê ve wek gerîla hatibûn nişandan, niha ji aliye me ve hatiye tesbit kirin ku, tev gundi ne, ji Xerarê ne. Ji eyni gundi du kur û keçeve Se- yid Mele ji hatine kuştin û hej- mara gundiyeñ ku ji aliye dewletê ve hatine qetilkirin, bi yêñ dawî re gîhiştane yanzehan."

HEZEX

10 kesen ku berî 3 hefteyan li Hezexê (İdilê) hatibûn girtin li Cizîre derxistin mehkemeyê.

Di dawiya danışına mehkemê de 6 kes hatin tewqîfîkirin. Navê wan ev in: Abdurrahman Dol-muş, Faik Kaplan, Abdulkerim Aslan, Ahmet Dîri, Alî Erdemci û Alî Aslan.

Li aliye din yekî bi navê Ne- zîr Duman ku ji Hezexê diçû Midyadê, ji aliye cerdevanan ve tê revandin.

de biryara qanunî bê standin.

Heta niha zêdetir û 100 es- nafl li hember vê çespîne maruz mane.

Li ser vê belavokê, esnafl navçeyê gelek bi endîse ne. Lewre berê, ji ber girtinê ke- pengen gelek kes ji hêzên dewletê lêdan xwaribûn û camen dukanen wan hatibûn şikandin. Li navçeyê esnafl bi vê tirsê di- jîn. "Gelo cezayê kepeng girtin- ne du qat dibe."

Girtiyê Şîrnexê hatin berdan

Di 17 Sibat 1993'an de Dodgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ya Diyarbekir girtiyen doza Şîrnexê berdan.

Weke tê zanîn di dema Newrozê de pişti qetîama Şîrnexê, ji Şîrnexê nêzîki 120 kesen bêsuc bi navê PKK'ê girtibûn. Dewlet vê qetîama xwe dixwest bixe stûyê van girtiyan. Lî feyde nekir û pişti re dewlet ew girtiyan bi dorê berda. 9 kesen ku di girtigehê de mabûn ji, di vê dodgeha 17 Sibatê de hatin berdan.

MÊZÎN

Zübeyir Aydar



Serdanek li başûrê Kurdistanê

J i serê vê mehê heta nehê mehê em li başûrê Kurdistanê bûn. Heyeta me ji neh kesan çêbûbû. Em haydarê (vex- wendi) serokê parlamentoya başûrê Kurdistanê bûn. Serokatiya heyeta me, Serokê Partiya me (HEP) Ahmet Türk bû.

Cûn û hatina me, di serdanen me de, ji serî heta binî tev di nava protokola yekemîn de buhuri. Dema em ji Dihokê derketin rî, hînek ji bajîr dûr ketin, tişte pêşî dixuya wêrankirina rîla (daristan) bû. Ji Dihok heta Hewlêrê herdu aliyan rî ji daran hatibûn rûtkirin. Lewre isal şewata rohn ji ber ambargoya Seddam pîr kêm peyda bûye. Ji ber vê zehfîn daran mixabin hatine birîn.

Dîsa li dora rî, gundên berhevkiirî pîr bûn. Xaniyên van gun- dan hemû wek hev bûn. Gundên di çiya de, yên bilave hemû ji tarafê hikûmeta Iraqê ve ji sala 1974'an pê ve hatine xerakirin. Ev gundên dora rî, ji bo xelkê wan gundan ava kirine. Tê gotin ji sala 1974'an pê ve 4000 gundan zêdetir hatine xerakirin.

Ez dema hilbijartina meha Gulanê ji li wê der bûm, vê carê tişî pêşî dihate ber çava organîzasyon bû. Vê carê, ji caran din çêtir tişî dihatin organîzékirin. Rêxistin, ji cara din çêtir bûn.

Pişti şeva pêşî li Hewlêrê me dest bi serdanen xwe yê fermî (resmi) kir. Pêşiyê me Serokê Parlamentoyê Cewher Namik li meqamê wî ziaret kir. Em li parlamentoyê geriyan. Xebata grûb û komisyonan û xebata nav meclisê me di cihê de dit. Pişti wê me Serokwezir Dr. Fuat Masum ziaret kir. Pê re bi rîzê ve me navend (merkez) ên hemû partian yeko yeko ziaret kir. Pişti van me waliyê Hewlêrê û zanîngeha (universite) Selahattin û Koma Mafê Mirovan ziaret kir. Weki din gelek kesen rewşenbir hatin em ziaret kirin.

Di serdan û axaftinê me de, pirsa mezin behsa şerê di navbera wan û PKK'ê de bû. Serokê partiyen mezin dixwestin xwe heq bikin, lê belê tu kesi nedigot ev tiştekî baş bû. Dema behsa têkiliyê wan û Tirkîyê dihate kirin, eniya gelekan xweydan dida û serê gelekan nivz (nizm) dibû. Di hemû civat û sohbetên me de, li yekîtî û têkiliyê Kurdan dihate axaftin. Qenaeta mezin ew bû ku, êdî ev xeletî çenebin û têkiliyê xurt di navbera her çar parçeyan de bêñ çêkirin. Welê dixuya ku, têkiliyê wan û PKK wê xurt bikin.

Lê di vê meselê de pirsa mezin xebata Tirkîyê ya li wê de ye. Tirkîyê iro li Zaxo Dihok û Şeqlawa buro vekirine. Van cihan xebatên xefu (veşâri) eskere dikin. Bi hînek eşîran re têkiliyê ne xweş datînin. Li tixûb (sinor) 70 qereqol têne çêkirin, ev lêvekiri- na Kurdan bi destê Kurdan e. Tirkîyê li Deriyê Xabûrê, li ser ne- fesa wan rûniştiye. Tişte ne bi keyfa wê bin nahêlin bibore. Welê dixuye dewleta Tirkîyê wê hînekî astengan li dijî wan çêke. Seri- razî ew e ku, bikarîbin dûvê xwe ji destê Tirkîyê derxin. Heke ni- karin wê pêk bînîn wê gelek zerarê bîbînîn, belki hin tişt bîbin xewn.

Avakirina rêxistinê dewletê li gor dîtina min hêdî hêdî dime- şe. Hêza Berê (cephe) Kurdistanê, ji hikûmetê xurttir e, hê ji di destê partian de imkanen dewletê hene. Me li ser van tiştan ji rexne xwe ji wan re got, wan ji heq da me.

Di serdana koma mafê mirovan de serokê wan behsa hînek xebatên xwe kirin. Got: "4000'an zêdetir gund hatine xerakirin, em dixwazin van gundan bi cih û nav ve tesbit bikin.

Di sala 1983'an de ji Eşîra Barzanîyan 8000 mîr ji taraf dewletê ve hatine birin û ev kesen han hemû hatine kuştin. Em dixwazin war bi nav û nişan tesbit bikin.

Di qetîama Helepçe û Qiladizê de çend kes hatine kuştin em dixwazin hemûyan bi nav û nişan tespit bikin.

Di hereketa Enfala de 182000 mîr ji bajar û gundên Kurdistanê hatine berhevkiirin. Ji van qederê 1000 kes zivirine, yên din hemû hatine kuştin, em dixwazin wan bi nav û nişan tesbit bikin.

Dîsa di nava van operasyonan de 12000 keçen Kurd ên deh-pazdeh sali ji teref dewletê ve hatine birin. Ev keçen han, birine nav ereba wekî cariye firotine. Em dixwazin van bi nav û nişan tesbit bikin.

Li ser van û gelek tiştan xebata me dewam dike, em alîkariyê dixwazin.

Me hînek tişte xweş hin yên ne xweş dîtin û bîhist. Tişte ji hemûyan ne xweşîr ew bû ku, Kurd bibe listikên dijiminan û biraku- jiye. Ev birin li ber çavê me hemîyan ji kul e. Me gelek dilen li ser vî şerî kulbûyî dîtin. Divê Kurd hemû ji rojêñ berî ders bistînîn. Heqê kesî tune dilê Kurdan kul bike. Têkiliyê bi dijiminan re li ser mirina Kurdan têñ danîn ji çavê Kurdan narevin. Ev hesap sibehî wê derkeve pêşîya me hemûyan, Kurd wê vî hesabî bipir- sin.

Divê herkes dev ji hesabî büyük berde. Em hemû bi neteweyî bifikirin, hesabî welat û mîlet bikin, gavêñ mezîn bavêjin.

Dewlet dixwaze li Dêrikê ci bike?

Navenda Nûçeyan- Polisên,

Emniyeta Dêrikê ya Mêrdînê, nûçeyen ku di çapemeniya bur- jûwa ya Tirkîyê de derketine bi awayekî teksîkirî li dukanen esnafan bi zorê didin daleqan- din. Qeymeqame Dêrikê ji girtina kepengen dukanan li dijî qanûnî ilan kir.

Li Navçeya Dêrikê, polisên Emniyeta Dêrikê nîvisen ku di eleniya Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan de di rojnameyên burjuwazî de der- ketibûn hemû li hev civandine û bi zorê bi esnafen navçeyê li dukanen wan didin daleqan- din.

Ev nûç, ji alî çapemeniyê ve bi awayekî ku rexne li sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan dibin, hatine civandin. Nû- ç, hatine teksîkirin û li came- kanen esnafan ji bo duh mehan ku bimîne pêkutî li esnafan te

Grev bi serfirazî qediya



Di herdu wêneyê jorîn de, kesen ku ji bo protestokirina kîrinê dewleta Tirk ên li Kurdistanê dest bi greva birçibûnê kîribûn têr dîtin. Grev di 24.1.1993'an de li bajarê Belçîqa, Bruselê li dar ketibû. Grev bi besdarbûna 15 mebûsen Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê û 700 welatparêz ve dest pê kîribû.

Navenda Nûçeyan- Li gelek bajarêne Tirkîye, Ewrûpa û Kurdistanê, grevê birçibûnê û protestokirina qetliam û zilma dewleta Tirk dewam dikin. Weke tê zanîn, li hember qetliam, cinayet û kîrinê qirêj ên dewleta Tirk li Kurdistanê dimeşîne, Mebûsen Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê roja 24'ê Çileya 1993'an dest bi greva birçibûnê kîribûn. Ji bo piştgiriya vê livbaziyê, li Tirkîye, Ewrûpa bi hezaran kesen Kurd, Tirk û Ewrûpi ji ketin grevê birçibûnê. Ev grev ne tenê li derive, li zindanan jî li dar ketin. Grevê birçibûnê hê jî bi hemû gurrbûn û gesbûna xwe ve dom dikin, li ber dîlan têr girtin û bala raya giştî ya dinyayê û saziyên demokratik tê kisan din ser rewşa gelê Kurd û hovîtiya dewleta Tirk.

Li aliye din, gelek sazî û komaleyên demokratik û partiyên siyasi, ji bo dorfirxkirina ve piştgiriya grevê li hember zilm û zorê, hin faaliyetê din jî li dar dixin. Civîn komcivîn, şevêni şahîyan, dîlan û meş jî tê kirin.

DAXUYANIYA 15 MEBÜSEN MECLISA NETEWEYÎ

Li ser van faaliyetan, roja 17'ê mehê, 15 mebûsen Kurd ji bo raya giştî daxuyaniyek belav kîrin. Di vê daxuyaniyê de bi kurtî wiha tê gotin: "Bi destpêkirina vê greva me ya li hember dagirkeriya li Kurdistanê, ji Avustralya bigirin heta Kanada, ji Finlandiya bigirin heta Moskovê, bi hezaran mirovîn welatparêz û demokrat ji dest bi grevê birçibûnê kîrin, bi sed hezaran mirovîn me bi kepengirtinan, bi meşan û boykotan piştgiriya xwe ji me

re nişan dan. Bi berxwedaneke bi vî rengî xurt, hate dîtin ku deriyêni diplomasîyê ji gelê Kurd re venedibû û hêdî hêdî têr vekirin, bi vî awayî politîkayê dewleta Tirk ên li ser qetliaman ava bûne, dikarin bêne teşhîkirin û bala raya giştî bê kîsandin.

Ji bo ku di parlamento ya Ewrûpa de, ambargoya silehan li ser Tirkîye bê danîn û di Newroz de heyet herin Kurdistanê soz û peyman hatin standin. Ji hemû kesen ku besdarê van faaliyetan bûne û piştgiriya xwe dane me, em spas dikin û di vê tékoşîna bi rûmet de ji wan re serfirazî hêvî dikin."

Piştî vê daxuyaniyê mebûsen Kurd greva birçibûnê qedan din.

GREVA BI DÎLAN

Ji 27'ê Çile ve grêven ku bi besdarîya 250 kesan li Edene, Mêrsin û Tarsûsê di avahîyen HEP'ê de hatibûn destpêkirin di van rojîn dawî de veguhîn dîlanê. Rojê bi hezaran kes besdarên grevê, ziyaret dikin, bi wan re govendê digirin, stran û klaman dibêjin.

Komîteya greva birçibûnê ya Edenê û Tarsûsê li ser van çalakiyan daxuyaniyek da çapemeyî, di daxuyaniyê de dewleta Tirk ji ber kîrinê wê yê hovâne û qetliamê ku li Kurdistanê dike, protesto dikin û talebêni dîlen zîndanê û yêne mebûsen neteweyî weke yêne xwe dipejirînin û piştgiriya xwe tînîn ziman.

LI KEÇÎÖREN GREV QEDIYA

Li navçeya Enqere, Keçîoren greva ku roja 11'ê Sibatê ji alyî 150 kesan ve li avahîya

HEP'ê hatibû destpêkirin, di roja xwe ya şeşemîn de qediya. Li aliye din, li Zîndana Girtî ya Navenda Enquerê ji girtî 6 roj ketin grevê.

GREV Û FAALIYETÊN LI EWRÛPA

Li gelek bajarêne Ewrûpa grev û çalakiyên ji bo piştgiriya mebûsen Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê dan xuyakirin. Navêwan ev in: Berpirsiyare Partiya Karkeran a Bernê; Brikoter Anna, Nûnerê Komara Italian; Marina Roth, Koordinatore Peñaberan (Multeciyen); Gysi Felix, Evûqat Roseman Rossi, Serokê Partiya Sosyalist ê Kanton Zug, Lang Joset, Seroka Alternatif Sosyalist û Hêşînan; Angeline Fankhauser, Mebûse Mafêni Mirovan û ST Gallen, saziya bidestxistina kar a Swîsre.

ALMANYA

Mainz: 100 kes ji roja 13'ê Sibatê ve ketin greva birçibûnê. Vê grevê bala gelek demokratîn Alman kîşande ser xwe. Weki din grûbek jin û zarok li ber avahiya televizyon ZDF xwepêşandanek li da rxistin. Hin mebûsen Partiya Hêşîn a Alman ji besdarê van faaliyetan bûn.

Manheim: 13'ê Sibatê 46 kes ketin greva birçibûnê. Grev bi şahî û ziyareta welatparêzan didome.

Saarbrueken: Di 14'ê Sibatê de 70 kes û keşeyen dêrê dest bi grevê kîrin. Grev ji aliye gîrsen gel û çapemeyî ve eleqeyeke xurt dibîne.

Bielefeld-Osnabrück: Li van herdu bajarân meş çêbûn. 700 kesen Kurd besdarê van meşan bûn. Piştî van meşan, 175 kes dest bi greva birçibûnê kîrin. Rojnameya Nove Westfalsch û Radyoya Bielefeld der heqê armanca meş û greva birçibûnê de nûçeyen dorfirx dan.

Weki din li Freibourgê 70 Kurd dest bi greva birçibûnê kîrin û 15 kesi ji li Kasel'ê avahîya SDP'ê işgal kîrin û ketin grevê.

Ji xeynî van deran, li Osnabrücke 50, li Bielefelde 100, li Münsterê 50 kesan dest bi greva birçibûnê kîrin.

SWÎSRE

Zurîh: Bi besdarîya hin biyaniyan ve meşike ji aliye 3000 kesi ve hate li dar xistin. Vê meşê li Zurîhê deng da.

Li Swîsre gelek saziyên demokratik û saziyên siyasi û kesen navdar piştgiriya xwe ji bo Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê dan xuyakirin. Navêwan ev in: Berpirsiyare Partiya Karkeran a Bernê; Brikoter Anna, Nûnerê Komara Italian; Marina Roth, Koordinatore Peñaberan (Multeciyen); Gysi Felix, Evûqat Roseman Rossi, Serokê Partiya Sosyalist ê Kanton Zug, Lang Joset, Seroka Alternatif Sosyalist û Hêşînan; Angeline Fankhauser, Mebûse Mafêni Mirovan û ST Gallen, saziya bidestxistina kar a Swîsre.

FRANSA

Parîs: Li navçeya Parîsê, St Gennevieve, zêdeyi 20 sazî û komaleyên demokratik, ji bo piştgiriya bi gelê Kurd re, di 13'ê Sibatê de şeveke şahîye li dar xistin. Di salona ku tê de şeva şahîye li dar ket belavok hatin belavkîrin û bi diwaran ve wêneyê li Kurdistanê hatine kîsandin, hatin daleqandin û bala biyaniyan kîsandin ser rewşa gelê Kurd.

LI SWÊDÊ MEŞ Û GREVA BIRÇIBÛNÊ

Ji bo protestokirina qetliam û vebirînê dewleta Tirk ên li Kurdistanê û ji bo piştgiriya greva birçibûnê ya li Bruselê di 12 û 13'ê Sibatê de, li Swêdê bajarêne Stockholm, Upssala, Goteborî, Bolnes û Borlengeyê nêziki 700 Kurd meş û xwepêşandan pêk anîn. Ev meş û xwepêşandan gelek bala raya giştî kîsandin. Çend parlamenteren Swêdê ji, besdarî van

xwepêşandan bûn. Ji Partiya Gel û Partiya Çep 2 parlamentêrên kevin ji besdarî van meşan bûn û axivîn. Partiya Sosyalist ji piştgiriya xwe ya Meclisa Neteweyî û grevê birçibûnê anî ziman. Li ser navê Yekîtiya Komunisten Ciwan ku bi xwe girêdayî Partiya Çep e 2 kes û li ser navê Yekîtiya Komunisten Ciwan ji 5 kes besdarî van xwepêşandan bûn û piştgiriya xwe pêk kîrin.

Di van xwepêşandan de, bi giştî dirûşmeyen bi Swêdî hatin avêtin, car bi car ji bi Kurdi dirûşmeyen wek: "Biji Meclisa Neteweyî", "Bimire Komara Tirk a Faşîst", "Biji Serok Apo" dihatin avêtin. Bi hezaran daxuyanî hatin belavkîrin. Rojname û radyoyen Swêdê van xwepêşandan di weşanên xwe de bi firehî dan. Li Stockholmê radyoyek bi navê "Merhaba" ku bi Tirkî deng dike, bi berpirsiyare ERNK'ê yê Swêdê re hevpeyvînek pêk anî.

Weki din, di 15 Sibat 1993'an de, li bajarê Stockholmê, li cihêne vekîri di konan de, bi besdarîya 100 kesi ve, ji bo hefteyekê greva birçibûnê dest pê kîr.

MEŞA PIŞTGIRIYÊ

Di roja 13.02.93'an de li bajarê Berlinê meşike mezin ji bo piştgiriya 15 nûnerên (mebûsen) Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê û bêhtirî 700 welatparêzen Kurd ku di bajarê Bruselê de ketine greva birçibûnê, pêk hat.

Ev meşan ku di bin insiyatîva Komeleya Botan de hatibû sazî kîrin, ji aliye YWK, YWK, YRK, YCK, YXK, Kurdistan AG-TU, TV-Cûdî û YDK (Yekîtiya Dîndarêne Kurdistanê) ve ji hate alîkarîkîrin.

Tunela azadiyê

Ji Girtîgeha Nevşehirê 18 girtiyen siyasi tuneleke 35 metroyi vedan û revyan.

Rêveberiya girtîgehê, roja 17'ê Sibatê bi reva girtiyen hesiya. Li ser vê revê, hêzên dewletê bi carekê ve li herêmê ketin alarmê. Ev reva girtiyen siyasi, di nav hikûmetê û rêveberiya girtîgehê de, bû sedemê gengeşiyen (munaqşe) mezin.

Ji wan girtiyen 9 kes jê, ji PKK'ê, 4 kes ji TDKP'ê 3 kes ji TIKKO, 2 kes ji, ji Dev-Sol'ê ne. Navê girtiyen ji ev in: "Mehmet Sever, Müsel Göleli, Mehmet Zengin, Hüseyin Yan, Ali Kanar, Emin Özbay, Yıldırım Arıca, Mehmet Savaş, Mehmet Vurucu, Gökhan Kaya, İbrahim Serdar Uğur, Hasan Durna, Hüseyin Yıldırım, Erol Özel, M. İsa Şahin, İmam Kitay, Mehmet Çelik û Abdullah Sönmez.

Ji balkonê avêtin

Di 2.2.1993'an de li Amedê, li Taxa Şehitlikê polis cerdi ser malekê kir. Polis, ji bo ifadegirtina Devrim Berkay wî dibin balkonê û didaleqinîn. Lé Devrim ji destê wan dikeve. Dû re Devrim birîneke xedar distîne. Wî dibin nexweşxaneya Fakulteya Tipê (Tip Fakültesi Hastanesi) û di lénêrinâ sîfîte (yoğun bakım) de ye, niha ji rewşa wî ya xedar dewam dike. Bawê Devrim der heqê vê bûyerê de wiha axivî: "Polis bi şev saet li dardora 5'an hatin ber mala me û li lawê min pirsin. Me got ne li mal e û dû re nav mala me gerîyan. Saet nêzîki 7'an bi lawê min re, cînî polis dîsa hatin malê û ji me re gotin, "Hün PKK'yî ne û lawê te ji militanê PKK'ê ye." Dû re lawê me girtin û birin balkonê. Me tiştî din nedît. Lé li gorî didevanan, polis ew ji balkonê avêtine."

Operasyona 'Gula Spî'

Bi navê operasyona "Gula Spî", di 4'ê Çileyê de "Ekîbîn Têkoşîna bi Teror" (Terörle Mücadele Ekipleri), dest pê kîribû. Di vê operasyonê de 11 kes hatibûn binçavkirin. Di nav mal û kargehê van kesan de, tu unsûren súci nehatibûn ditin. Li ser vê yekê polis, rojnameya Welat û Yeni Ülke û pirtükîn weşanen Melsa derketibû, ji çapemeniya re wek delilîn súci nişan dane.

Dema polis ev weşan pêşkêsi çapemeniyê kir û ev daxuyanî kir: "Di légerîna nav malen van kesen ku mensûbê PKK'ê ne de, me 100 Mark û gelek dokumanen aîdê rêxistina wan bi dest xistin."

Di nav binçavkirinan de Zeynel Çelenk û Mustafa İzzî di

Agir ji devê İsmet Sezgîn dibare:

'Em bixwazin emê Kurdan tev de bikujin'

Navenda Nûçeyan- Wezîre Karê Hundirîn İsmet Sezgîn, tevî heyeteke Alman li Diyarbekir û navçeyen wê gerek pêk a-nîn. İsmet Sezgîn li Balefirgeha Diyarbekir pirsên rojnamevanan bersivand. Di vê axaftina nav İsmet Sezgîn û rojnamevanan de, li ser pirsekê İsmet Sezgîn wiha got: "Ger em bixwazin, emê di demeke kurt'de, hemû PKK'van û sempatizanen wan bigirin, li cihekî bicivînin û hemûyan bikujin. Ev hêza me heye." İsmet Sezgîn axaftina xwe wiha domand: "Lê dewleta me dewleteke demokratik e, ji ber vê ji, em dixwazin vê meselê di çarçoveya demokrasiyê de hal bikin." Ev gotinê İsmet Sezgîn, ji alî gelek kes û saziyan ve hate rexnekirin. Serokê Partiya Keda Gel (HEP) Ahmet Türk, li ser vê axaftinê beyaneke çapemeniyê weşand. Ahmet Türk, di beyana xwe de wiha dibêje: "Sedemê 600 cinayetên ku ji salekê ve ye li herêmê pêk hatîne, di van gotinê İsmet Sezgîn de veşarı ye. Di Tebaxa 1992'an de, dema Şîrnex ji alî hêzên dewletê ve hatibû hilweşandin ji, İsmet Sezgîn di hevpeyîna xwe ya rojnameya Cumhuriyetê de, dîtinê xwe yêni bi vî rengî eşkere kîribû. Di wê demê de, çend gundên Şîr-



Drakula İsmet

(Ji Özgür Gündem)

nexê, ji alî balefirên dewletê ve, bi bombeyan hatibûn şewitan-din û hêzên dewletê nedîhiştin çapemenî bikeve herêmê. İsmet Sezgîn li ser van bûyeran wiha gotibû: "Yê ku bikeve hemamê wê xwêdan bide, ew hemû alî-girên PKK'ê ne. Alîkarî, bi vê rêxistinê re kirine, ji wan re çek birine." Lê xelkê ku ji van gundan hatibûn girtin, bi tevayı ji mehkemê berat bûne û hatine berdan. Wezîre karê hundirîn bi van gotinan xwe dide dest û dîtinê me rast derdikevin." Li

ser vê beyana İsmet Sezgîn, ji partiyan ji rexne hatin. Ji ANAP'ê Cumhur Ersümer û Vehbi Dînçerler, ji CHP'ê Er-tugrul Günay û Uluç Gürkan, ji RP'ê Şevket Kazan rexne li İsmet Sezgîn girtin. Ji DYP'ê Güneş Müftüoğlu ji, beyana İsmet Sezgîn weke "Ji mecseda xwe dûr ketiye" nirxand. Ji Komeleya Mafen Mirovan, Sekreterê Giştî Hüsnü Öndül ji, beyanek çapemeniyê weşand. Beyana Hüsnü Öndül bi kurtî wiha ye: "Ev metodên Naziyan e.

Eşref Bîtlîs di erdê de çikili



Generalen Giştî yê Jendermayê Eşref Bîtlîs

Navenda Nûçeyan- Roja 17'ê Sibatê, di qezaya balefirê de Generalen Giştî yê Jendermayan, Eşref Bîtlîs û 4 serbazen (subayen) din mirin. Eşref Bîtlîs di tespitkirina politikayen dewleta Türk ên li ser Kurdistanê de rola yekemîn dilist.

Roja Çarşemê, ji bo çûna Diyarbekir balefira Eşref Bîtlîs saet

li 12.20'ân, li Enquerê ji Balefirgeha Güvercînlik a leşkerî rabû. Pişti pênc deqiqeyen din ji ber arizeyeke ku sebeba wê nayê zanîn, balefir terabû hewşa avahiya PTT'ê ya li Yenimahale. Balefir di nav demeke kurt de giş şewîti û serleskeren tê de tev hûr hûr bûn.


Di balefirê de xeynî Eşref Bîtlîs; Albay Fahir Işik, Piloten balefirê, Yaşar Eliyar, Tuğrul Sezgînler û Emin Önder ji hebûn. Zilamekî ku di nezîkî qezayê de derbas dibû ji birindar bû. Nayê wî Ruhî Salay e.

Rayedarên dewletê li ser vê qezayê dîtinê dijber pêşkêsi din. Hin ji wan dibejin sabotoja PKK'ê ye hin ji ihtimal nadîn sabotajê. Heta niha tu rêxistin li ser qezayê tu daxuyanî nekrine. Weke tê zanîn Eşref Bîtlîs di şerî Başûr yê navbera PKK'ê û Komara Türk û hevalbendê wî de, roleke mezin dilist û têkiliyên xurt bi Berzanî û Telabanî re danibû.

Serokê HEP'ê Ahmet Türk:

HEP bê girtin emê meclîsê terk bikin

Navenda Nûçeyan- Serokê Partiya Keda Gel (HEP) Ahmet Türk, der mafî daweya girtina HEP'ê de, beyanekê da çapemeniyê. Ahmet Türk, di beyana xwe de wiha got: "Pişti HEP'ê, ji bo girtina ÖZDEP'ê ji dawe hatiye vekirin. Bi vî awayî dixwazin riya parlamento û zemîna têkoşîna demokratik li ber Kurdan bigirin. Ev bawerî xelet e, em bi hemû hêza xwe têkoşîna xwe ya demokratik didomînin." Ahmet Türk, diyar kir ku, heta HEP were girtin, dê di nav partiyê de têkoşîna xwe bidomînin. Ahmet Türk gotinê xwe wiha didomîne: "Ew tewra ku riya têkoşînen demokratik dixetimîne, ger HEP bê girtin, dê li hember hemû partîyan bê meşandin. Em têkoşîn didin ku ev derî neyê girtin. Lé ger em serifraz nebin tu maneya avakirina partîyeke din nîn e. Ji ber vê



Ahmet Türk

yeke ji, em difikirin ku, di rewseke wiha de, meclîsê terk bikin."

Li aliye din HEP li ser Kontr-gerîla û bêdengiya hikûmetê ji, beyaneke çapemeniyê weşand. Di vê beyanê de, li ser cinayetên kontr-gerîla û MİT'ê tê sekinandin û tewra hikûmetê tê rexnekirin.

Kuştinê bêmehkemekirin û di işkencyan de, li gor kîjan armanc û baweriye hatine kirin, eşkere bûn." Komeleya Hiqûvanen Hemdem ji, li beyana İsmet Sezgîn rexne girt.

JI NÛ VE LI GUNDÊN KONTRAYAN

İsmet Sezgîn û heyeta Alman, pişti legerînên li Girtîgeha Amedê, berê xwe dan 2 gundê kontrayan. Ji van gun-dan li Sûsa (Yolaç) yê, par 10 endamên hizb-i kontra ji alî gerîlayen ARGK'ê ve hatibûn kuştin. Gerîla bi kincen leşkerî çubûn ber camiyekê ku kontra ji xwe re kirine wargeh û tê de perwerde dibin. Dema kontrayen di nobetê de, gerîlayan di kincen leşkeran de dibinin, ji wan parolaya artêsa Tirk di-pirsin. Dû re 10 kes ji kontrayan ji alî gerîla ve têne kuştin. Li ser vê bûyerê, waliyê Diyarbekirê çubûn gund û diyânetê ji serxweşiyek weşandibû.

Gundê din Garisiyajorîn ji, heftiya çuyî ji alî kontrayan ve hatibû işxalkirin. Gundî, ji alî kontrayan ve ji gund hatibûne avêtin û vî gundî ji xwe re kiri-bûn wargeh.

Sedemê çûna heyeta Alman û İsmet Sezgîn ne kifş e.

Qumandarê Herêma Çaremîn a Eyaleta Mêrdînê İsmâîl:

'Xwestinê dijmin berevajî bikin'

Du zarokên wan derketin derive û li ser nizanim ci şer kirin. Yek ji wan giriya. Diya wan çû bi telbê wan ve, dengê wê ji derive dihat, digot: "Lawo, Xwedê emr û jiyê we qut bike, hevalen we wa tev bûne gerîla, hûn hêja li ser xarekê (holîkekê) şer dikan, Rebî Xwedê we ji min bistîne."

Saet li dehan em ketin rê, ez û hevalekî milîs bûn. Riya me ji pîr dûr bû. Qet nebe, lazim bû em sê-çar saet bimeşin, vêca di vê berf û mijê de. Hina 20 deqiqe di ser rêveçûna me re derbas nebûbû, ji westan hilehil bi min ket, hevalê min ê milîs ji min zehftir hilehil dikir û ji westa bostek zimanê wî kişiyabû, fişefîş pê ketibû. Hingê min jê re got, "Ka te digot jixwe ez nizanim westabûn ci ye." Wî ji berê xwe da min û got, "È ne ez, newestiyam! Lî tu dixwazî em hinek bisekinin û bêhna xwe vedin, ji bo te, ne ji bo min. "Dema wî wilô got, bi min ji bû ïnat û min got", Pa wele em nasekinin."

MA QEY EM JÎ NE KURD IN

Jî bo hevdîtina gerîla, piştî meşke dirêj di nav berf û mijekî sift de em gîhiştin gundekî. Li gund zilamek hat pêşîya me û em birin mala xwe. Me jê re got: "Riya me hîna dirêj e û di vê berfê de em nikarin bimeşin, ji me re terextorek ji gund peyde bike." Zilam got, "Hûn rûnên ezê vêga vegerim" û derket, piştî deh deqiqeyê din vegeriya. Li ba me rûnişt û dest bi gazinan kir. Digot: "Ma qey em ji ne Kurd in, mafê me ji tune em welatparêziye bikin? Weleb û bileh ez wilo qebûl nakim, ma ciyê min û pîreka min ji wan kesen din kêm e?"

Min ji hevalê bi xwe re pîrsî ka mesele ci ye? Wî got: "Ev camêr, berê milîs bû, ev demeke ew ji milîsiyê avêtine, vêca pîr li zora wî diçê."

Mala vî zilami di xaniyekî xirbende bû, di hundir de ji, çend firaq û du-sê heb merşikên kevin hebûn. Kifş bû ku zêde feqîr e.

Hevalê min ji xwediyê malê re got: "Heval birçî ye, emê herin mala muxtar bila xwarinê bixwe." Hingê pîr hêrs bû û got: "Ma qey ev mala êsîra ye? Ev mala partiyê ye. Çawa tu dibêji bila heval here mala muxtar xwarinê bixwe."

Partiyê ev zilam ji milîsiyê avêtibû, ji ber wê yekê, hema hema dikira biteqîya ji kerban. Car caran di nav xeberdanen xwe de ji gotinê Serok mînak dida. Digot, "Serok dibêje, hema xwe bi cil û rest bikin, ne ji bo me, ji bo xwe da ku hûn karibin xwe biparêzin."

HEVALÊN WE TEV BÛNE GERÎLA

Terextora ku ji me re anîn nesîxûlî tevî vî milîsî kevin em dîsa peyâ ketin rê û me berê xwe da gundekî din. Nêzîkî saeteke din em gîhiştin gund, li wir wî em testîmî milîsîn gundê din kirin û ve-

gerîla. Li wir ji em çûn malekê. Zilamek ixtiyar tevî malbata xwe xérhatina me kirin. Zilam ixtiyar tebeqa xwe ya titûnê derxist û da me û dest pê kir li ser welatparêziye şitexili. Pîreka zilam û çend zarok ji, li dora sobê rûniştin û bi baldarı guhdariya me kirin. Ji nişka ve du zarokên wan derketin derive û li ser nizanim ci şer kirin. Yek ji wan giriya. Diya wan çû bi telbê wan ve, dengê wê ji derive dihat, digot: "Lawo, Xwedê emr û

bû ku hatibû herêmê, li dema em ketin sohbetê, her çiqas ez ji wê herêmê me, ji min zehftir mirovên wê hêlê yên baş û xerab nas dikirin û her cure agahdarî der heqê herêmê de, di destê wî de hebû. Heval İsmâîl bi Kurmanciya hêla Botan diştexili û bi Tirkî nizanibû biştexile, lê ji rojnameyên Tirkî fêm dikir. Ji ber yê yekê min fêm kir ku bi eslê xwe ne ji bakurê Kurdistanê ye. Me dest bi sohbetê kir.

Heta niha gerîla dihatin vê herêmê ji, bes wek grûbên biçük dihatin demeke kurt diman, ev grûb ji an ûmha dibûn, an ji dîsa vedigeriyan warê xwe yê berê. Bi vî rengî ev herêm vala dima. Lî ev nêzîkî salekî ye gerîla bi giranî li ser vê helê ji diseke û girîngiyê didê.

sar û tiral e.

Berê tesîra PDK'ê li ser van deveran hebûye, hê ji hinek xuya dike. Heta niha mîletê vê derê hinek di navbera PDK'ê û PKK'ê de du-dîlî maye, lê piştî şerê Başûr ev du-dîlî ji, ji holê rabû. Edî her kes xwe nas kir. Mirovên ku dostaniya PDK'ê dikirin vê dawiyê xwe didin alî û dibêjin, "PDK, ne rast hereket kir, ew bûye partiyeke bi dijmin ve girêdayî, ne tenê bi dijminen Tirk, bi yê împeryalist ve

geren geleri yê girseyî diguherin. Tişte guheriye ev e ku, dijmin hînekî din zordariya xwe zêde kiriye, gel ji bi awayen cur be cur rê li ber dijmin digire; da ku qetîlamân mezin çenebin.

Li vê herêmê, heta berî salek du salan zêde kes nedihatın girtin. İro em dinîn zîndan û qereqolên van deveran bi dev re tije ne. Ev ji nişan dide ku, gelê vê herêmê ji edî bi xurtî dikeve nav têkoşina partiyê û hêviya xwe bi şoreşê ve hêdi hêdi girê dide.

Di van demen davî de milisiya gundan ji bala me kişand. Li vê hêlê, heta berî çend salan mirov bi gundiyeke re bi hêsanî nikaribû li ser şoreşê biştexile, pîr ditirsiyan. Lî niha her gundiyeke bûye wek partizanek; sebebê vê pêşketina gundiyan ci ye?

SİSTEMA MILİSİYÊ RÜDINÊ

- Li Kurdistanê dema şer li deverekî bi peş ve diçê, tesîra xwe li deveren din ji dike. Gavê di sala 92'an de hatin avetiñ, baş tên xu-yakirin û dinya ji dibîne. Sala 92'an bû sala PKK'ê. Di salê de bi sedan qereqolên dijmin hatin rûxandin û rakirin, bi sedan kesen ku ji dijmin re dixebeitin hatin cezakirin. Vê têkoşin û serfiraziya gerîla, gelê me bi xurtî ji gundiyan me şiyartir û bawertir kir.


Li aliye din, meseleya birêexistina gundiyan heye. Lî vê herêmê ji gundi, rêexistinê xwe yê milîsi hêdi hêdi çedîkin û ev sistem hêdi dikeve jiyanê.

Ger hûn dixwazin, em hinek ji li ser rewşa Batmanê bisekinin. Batmanê ji berê ve bajarekî bi siyasetê ve girêdayî ye. Berî 80'an ji, li Batmanê têkoşîneke xurt hatiye dayin. Ji ber vê yekê wisa dihat hêvîkirin ku ev têkoşin li pey xwe miraseke bas bibêle. Lî em iro dinîn weke ku gelê Batmanê bizdiya be. Welatparêzi û alîkariya bi gerîla re deynîn aliyeke, qet newêre deriye xwe ji şoreşeran re veke. Tirs û xofek ketiye dilê Batmanîyan, sebeba vê tîrsê û çareserkirina vê rewşê ci ye?

Bi rastî ji, Batman miraseke mezin bû ji bo partiyê, keleheke partiyê bû di Kurdistanê de. Ji ber vî aliye wê, dijmin giranî û girîngiyêke mezin da Batmanê û bi hemû hêza xwe ve kete Batmanê. Lî disa ji ev tîrsa di dilê gelê Batmanê de ne ji ber hebûn û hêza dijmin tê.

Milet bi rê ve diçê, hew dibîne fişek ji paş ve lê ket. Nizane kengê û ji ku ve wê ev fişek were. Van cinayetên kontrayan hinek milet tîrsandiye.

Wê bidome



Li gor Serokê Herêma 4. İsmâîl Rojnameya Welat hem yekîtiya me pêk fine, hem xeberên rast dide, hem ji heqîqet û dîroka mîletê Kurd pê didezanîn.

Herêma 4. ji ku derê heta ku derê ye?

- Ji Çemê Başûr heta Pira Mala Badê. Misircê, Bişêri û Eskîf dikeve nav herêma 4.

Zehmetiyê vê herêmê ci ne, ferqa vir û wan herêmên din ci ye?

REWŞA GEL

- Ji aliye xebatên gerîla ve, ev hêl weke hêla Botan û Mêrdînê bi peş neketiye. Li wan deveran, ji destpêka şerê çekdarî ve gerîla bi xurtî cih girtiye û şax daye, lê li vir gerîla zede nemane.

Heta niha gerîla dihatin vê herêmê ji, bes wek grûbên biçük dihatin demeke kurt diman, ev grûb ji an ûmha dibûn, an ji dîsa vedigeriyan warê xwe yê berê. Bi vî rengî ev herêm vala dima. Lî ev nêzîkî salekî ye gerîla bi giranî li ser vê helê ji diseke û girîngiyê didê.

Miletê vê herêmê ji aliye zanbûnê ve, ji yê hêla Botan û Mêrdînê pêşvetir e, bes hinek ser-

ji hatiye girêdan." Bi vî rengî, ew ji ber bi PKK'ê ve tên.

Sala çûyi, bi giştî geşbûneke girseyî hebû. Serhildan û meş ji hev nedigetîyan, li vê herêmê û li Misircê bi xwe ji gelek caran esnafan kepengen xwe digirtin, şoferañ erebeyen xwe nedixebeitandin, ji gundan gundi, ber bi bajêr ve dimesîyan, bi deh hezaran kes digibiştin hev û dewlet protesto dikirin. Yanê bi giştî tergerekke gurû û geş di nav gel de xwe dida xuyakirin, lê niha ew germayî û geşî kêm bûye, sebeba vê ci ye?

EV GEL EYNÎ GEL E

- Qetîlamân ku îsal dijmin di Kurdistanê dikirin, ne tenê li vê herêmê, li hemû Kurdistanê ev geşbûn pariye kemirî.

Lî ev gel eynî gel e. Yanî par gelekî din li yê herêmê tune bû. Ji ber vê yekê, car dim ev gel ji berxwedan û serhildanen re hazir e. Bes car caran li gor takîkên partiyê, awayê şekil û awayen tev-



Guka çeyî gayê çeyî ra
nêtersena.

Vateyê Vêrînan Kirdan


Kontrwalî û pirsnameya kontrgerîla

Li Tirkîyê ci dibe? Bersiva vê pirsê dibe ku, "Gelo ci nabe?" be. Lewre birêzkirina nebûiyîan ji tiştên bûyi gelek hêsanter e. Xwedê emrê vê hikûmeta koalisyonê dirêj bike. Her ku ev hikûmet li serî be, emê hê gelek tiştên sosret û nebûyi bibînin.

Hikûmeta koalisyonê heftiya çûyi, bi gotineke Waliyê Şîrnexê-Şîrnexa min a reben xwedî walî! ye jî Mustafa Malay zelzeleyek derbas kir. Ev gotin ta hîmê hikûmetê hejand û hindik mabû, Erdalê min ê serhejok, ji textê xwe (ku bi çar lingan xwe lê pêçaye) bikeve.

Mustafa Malay ji bo pirsîrêkên walîtiya xwe û herêmê bîne ziman, besdarî civîna heyeta wezîran bûbû. Lî Malay, mîna zarokênu ku di civata mezinan de rû-dinê, û bi xwe de d...n, ji hedê xwe derket û gotinêni ji serê xwe mezintir kirin. Li gor Waliyê Şîrnexê, hin ji karker û karmendênu ku ji aliyê Wezîrê Bayindiriyê ve tayînê wan têne çêkirin û têne li Şîrnexê dest bi kar di-kin PKK'van in.

Gotinêni waliyê Şîrnexê, di nav civîna heyeta wezîran de, mîna bombe teqîya û hema Wezîrê Bayindiriyê Onur Kumbaracîbaşî rabû ser lingan û berê xwe da Walî Malay. Gotinêni wezîr gelek tûj bûn. Digot: "Hedê xwe bizanibe." Digot: "Tu kî yi?" Digot: "Terbiyesîz" û hwd. Kontr walî gelek bi ber xwe ket û



Waliyê Şîrnexê Mustafa Malay

rûnişti ji bo istifakirinê namayekê nivîsand. Di rastiyê de, waliyê Şîrnexa min a bi 5 hezar şenî, bi wezîfeyên gelek girîng li hîrêmê bû. Ew jî, mîna pirraniya rayedarîn şerê taybetî, endamê Daîreya Şerê Taybetî bû, yanî Kontra bû. Bi armanca qirkirina Kurdan vê wezîfe-ya xwe ya pîroz bi dil û can û bi heyecan didomand. Lewre jî, hêza Onur Kumbaracîbaşî têr nekir ku Kontr Walî ji cihê wî bike û waliyê Şîrnexa min a bi 5 hezar şenî li cihê xwe ma.

Bûyerêni bi vî rengi û ecêb, xwe da nav partiya Sosyal Demokratian, şîrikê koalisyonê SHP'ê di jî diyar dikan. SHP, di dema hilbijartînê de, ji bo Tirkîyeyek demokrat raya gel dixwest. Lî piştî ku bi DYP'ê re koalisyonê danîn û desthelatê bi dest xistin, ji bilî ku bikevin bin emrê generalan û bibin hikûmeta şerê taybetî

tu tiştî nekirin. Erdalê kurê dewletê, ji bo menfaetên bavikê xwe, dev ji demokrasî memokrasiyê berda. Edî tiştî grîng, jîn û hebûna dewletê bû.

Bi kuştina rojnameger-nivîskar Uğur Mumcu re, li Tirkîyê guftûgoya geleb tiştan hate kirin. Her yek li gorî xwe, li dû van cinayetan hêzekê didît. Hizballah, Îran, PKK, CIA, Kontr-gerîla û hwd. çend ji van hêzan bûn. Hin kes, bi giranî li ser Kontr-gerîla disekinin. Çend ji van kesan ji mebûsên SHP'ê bûn û ji bo pîrsa kontr-gerîla di meclîsê de bê guftûgokirin û hîye-teke lêgerîna kontr-gerîla amade bibe, amade kariya pîrsameyekê kirin. Û veca SHP di nav xwe de heiyya. Erdalê kurê dewletê bi hemû hêza xwe li hember vê pîrsameyê sekînî. Erdal di-got: "Em di hikûmetê de ne. Em pîrske wiha bibin meclîsê dê hikûmet bikeve. Dema ku em bi serê xwe werin iqtîdarê, em dê dikarîbin li dû pîrsen wiha bigerin. Dû re pîrsame di grûba SHP'ê de, bi dengdanna mebûsan hate redkirin.

Xuya ye ku Erdal Înönü ji gelek tiştan hayêdare. bi kontr-gerîla jî zane. Lî ji bo jîn û hebûna dewletê çavên xwe ji tiştîn wiha re digire.

Belê, wezîfeya Erdal jî, di hikûmetê de, çavgirtin û serhejandin e. Em bîbêjin ci? Ev yek jî bi bêmiradê kurê İsmet Paşa dikeve!

Nijad Yarûk

DI HEJMARÊN PÊŞIYA ME DE

- Bi Osman Sebrî re hevpeyvîn
- Dengbêjê nemir Miradko

Beşîr Botanî

- Malîn Mêrdînê dibin kavîl

Jîr Dilovan

- Proja GAP'ê ci ye?

Bêrîvana Dêrsimî


- Bi Kalê Newrozê re hevpeyvîn
- Mirina şervanekî

M. Baran

- Bi Ozan Şemdin re hevpeyvîn
- Çend mînak ji zargotinê Kurdî
- Bi Üsîvê Batê re li ser dîroka eşîrên Kurdistanê û Elîkê Batê

TÎR

Musa Anter



Dewleta kontrgerîla di 20 ilon 1992'an de Apê Musa ji nav me bir

Welat bi xwedî be

Cima em derdi Kevin? Adet e, wextê ku rojnameyek derdi keve dibêjin "çima em derdi Kevin?" Ica ji bo Welat, gerek em bêjin ci-ma emê dernekevin? Ji ber ku tu îşê welatê me yê feqîr pêk nehatiye. Welat bi xwedî be, lê heta niha bê xwedî mabû.

Kin ew e ku em bêjin: Ji bo em bibin xwediyê welatê xwe em derdi Kevin. Gotina pêşîya ye: Gerek mirov, hespê xwe, çekê xwe û welatê xwe meke destê xelkê. Ji ber ku xelk guh nadin welatê mirov, talî xerab dibe. Wek iro welatê me. Hîn di ser de jî, welat kirine wek cihe şewtê, hêtunê. Ji hawîrdor rivîn û duxan bilind dibe. Di nav rivîn û dûmanê de qêrîna jin û bavan e, zarokênu me di nav êgir de bûne wek seryên kizîrandî. Ma kî kare bêje na. Wa ye Helepe, Licê, Quipê, Cizîrê û Nisêbînê.

Erê, em ji bo vemirandina vî agirî derdi Kevin. Ji bo xelasîya pîrek, bavû kal û zarokênu xwe em derdi Kevin.

Xelkê em kerr û lal kirine. Em nema ji zimanê hev fêm dikan. Ji bo ku em hînî zimanê xwe û hev bibin em derdi Kevin.. İnsan ku ji hev hîn nebe, li hev nayê, li hev nabane. Em ji bo baneya hev derdi Kevin.

Ji bo xelasî û serbilindiya temamê Tirkîyê û xelke Tirkîyê û ji bo biratiya Tirk û Kurdan em derdi Kevin.

Pirsek bi Tirkî heye. Dibêjin, welatê ku tu xwînê lê nerijînî, ne welat e.

Ma gelo kesî wek me li welatê xwe xwîn rijandîye?


Welat, Hejmar 1, 22 Sibat 1992




Bila dîlê te şad be Apol Welat ne bêxwedî ye. Tu nayê jibirkirin.

Di salekê de 14 rojnamevan hatin kuştin û qatilên tu yekî nehate girtin.


Herkes qatil dizane




Cengiz Altun



Hafiz Akademir



Yahya Orhan



Hüseyin Deniz



Musa Anter

Navenda Nûçeyan- Rojnameya Özgür Gündem'ê piştî girtina xwe ji şehîdan dide. Nûnerê Özgür Gündem ê Ruhayê û nûçevanê Yenî Ülke Kemal Kiliç, roja 19'ê Sibatê saet di 18.30'an de, ji ali kontrayan ve hate kuştin.

Kemal Kiliç, weke her carî ji buroya Özgür Gündemê ji bo biçe gunde xwe yê Kulunç'ê dertê. Dema ji otobêse peya di be 4 kes riya wî digirin û dixwazin wî birevînin. Kemal Kiliç li

ber xwe dide û bi van 4 kesan re şer dike. Dema ku kontra fêm diken, wê nikaribin Kemal Kiliç birevînin, 2 gulle berî serê wî didin û bi erebeyeke spî bêyi ku farêne pêxîn direvin.

Notirvan (bekçi)'ekî ku bûye şahîdê qetilkirina Kemal Kiliç, wiha dibêje: "Min dît ku çend kes şer diken, lê min got qey xorten gund di nav xwe de pev diçin. Lewre ji têkilî wan nebum. Piştî ku min dengê teqînê bîhist, cûm û ji benzînxanê

telefonî qereqola cendirmeyan kir. Erîşkar dû re bi erebeyeke Renault û spî bêyi ku farêne vê pêxîn ber bi Ruhayê ve çûn."

Kemal Kiliç, çendeki berê ji ber hin beyanen xwe ji ali polisan ve 2 caran hatibû girtin. Kemal Kiliç, ji ber erîşen ser rojnamegeren Özgür Gündem, parastina xwe ji walîtiyê xwestibû.

Cendirme piştî kuştina Kemal bi 20 deqeyan têne cihê bûyerê. Dû re 2 saetan ji li hêviya hatina dozger tê sekinandin. Piştî ku dozger lékolîna xwe xelas dike, 45 deqe ji hatina ambulansê dajo. Di vê navê de, polis û tîm, bi dehan fotografen Kemal Kiliç dikşînin.

Hêzên dewletê cendekê Kemal Kiliç, ji bo otopsiyê dîbin Ruhayê. Dotira roje ji, cendekê Kemal bi zorê ji destê malbat û hevalen wî direvînin. Dû re cenaze ji polisan tê standin û li gund bi merasimeke xurt tê binaxkirin.

Kemal Kiliç 30 salî bû û li Yenî Ülke dest bi rojnamegeriyê kiribû. Piştî ku Özgür Gündem vebû, bû nûnerê vê rojnameyê ya Ruhayê. Kemal Kiliç di Rêveberiya Komeleya Mafêni Mirovan a Ruhayê de bû.

Li ser kuştina Kemal Kiliç Rojnameya Özgür Gündem, Yenî Ülke, HEP û Komeleya Mafêni Mirovan ji bo çapemniyê daxuyaniyek weşandin. Özgür Gündem bi sernavê "Özgür Gündem şehîdekî din ji da" dest pê dike û piştî qewimandina bûyerê tê diyarkirin, wiha didome: "Qatilê Kemal Kiliç, ew kesen ku ji nîvîsandina rastian ditirsin in. Ji ber vê yekê ji, em edî naxwazin gotina "faîli meçhûl" bê dubarekirin.

Qatilê hevalê me eşkere ye. Qatilê Kemal, ew dewleta ku qatilên 7 rojnamevanen me yê din negirt û li herêmê kuştina bi sedan mirovan meçhûl hiştî ye. Kemal Kiliç, ji walî parastina xwe xwestibû, lê hêzên dewletê şuna ku wî biparêzin, rabûn wî li ser beyanen wî girtin. Qatil ew bi xwe ne.

Cenazeyê Kemal Kiliç çîma hate revandin, ew dewleta ku di cenazeyê Uğur Mumcu da, xelkê vexwendiyê beşdarbûna cenazê dikir, bi revandina cendekê Kemal dixwaze ci veşcere? Dixwazin kê biparêzin û ji ci ditîrsin?


Divê dewlet bersiva van pirsan bide. Em qatilan dinasin. Dewlet ji dinase. Em zanin ku bedelê rast nîvîsandina bûyeran mirin e. Me vê bedelê, ji roja ku em derketine, bi kuştina Hafiz Akdemir, Yahya Orhan, Hüseyin Deniz, Musa Anter, Halil Adanir, Kemal Ekinci, Lokman Gündüz, Orhan Karaçar û Kemal Kiliç daye. Em amade ne ku, ji iro pê ve ji bidin. Emê ji bo gelê me rast agahdar bibe di

vê riyê de bimeşin. Em ji mirînê natîrsin, lê ew ên ku ji rastian ditîrsin bila tîrsa xwe hê zêdetir bikin. Em ji riya xwe venagrin."

Rojnameya Yenî Ülke ji, di beyana xwe de, kuştina Kemal Kiliç protesto kir. Beyana Yenî Ülke, bi kurtî wiha ye: "Dewlet di cenazê Uğur Mumcu de, gîrsen gel berî kuçeyan da û bi navê parastina demokrasiye meşan li dar xist. Lê tehmul nekir ku cenazê Kemal Kiliç, bi destê gel bê veşartin. Em qatilan dinasin û heta ku ji wan hebab bê pîrsin, em li dû wan in."

HEP û Komeleya Mafêni Mirovan ji, di beyanen xwe de, kuştina Kemal Kiliç protesto kirin û ji vê cinayetê dewletê berpirsiyar girtin.

Hêzên dewletê, piştî ku Kemal Kiliç hate kuştin û cendekê wî revandin, bi ser buroya Özgür Gündem ve girtin û nehiştin ku kes bikeve hundir. Xuya ye ku tîrsa wan gelek mezin e. Piştî ku yekî dikujin ji cenazê wî ji ditîrsin û ev tîrs wan bêhtir erîşkar û har dike.



Kemal Kiliç, di salekê de, şehîde 8'an.

Li Mêrsînê qetlîam

Li nêzi ku dê rojnameya me bikeve çapê, ji Mêrsînê nûçeyekê provakasyon û qetlîama polisan kete destê me. Li gor vê agahiyê, welatparêzen Kurd ji bo dawîlêanîna greva birçibûnê ya ku ji bo destekkirina mebûsênî Meclisa Neteweyî li dar xistibûn, li Taxa Yenîpazarê, dest bi dilanêke girseyî dikir. Di nav beşdarên dilanê de çend provakator ji hene. Polis bi provakasyona van provakatoran gîrsen gel gullebaran dikir. Hejmara birîndarén ku di vê gullebaranê de birîndar bûne ne kifş e. Lî li gor agahiyân, bi dehan kes bi gulle û copan birîndar in, zêdeyî 100 kes ji hatine girtin.

Li gor agahiyân ku me bi telefonê ji Mêrsînê girtin, polis û provakator vê qetlîamê bi pîlan û program amade kirine û meşandine.

Polîs nobetê digire kontra dikuje

Navenda Nûçeyan- Erîş û cinayetên hizb-î kontra bi destek û rînîşandanen dewletê ve didomin. Di kuştina welatparêzan de, hêzên dewletê bi awayekî vekirî cih digirin. Cihen ku lê êrîşen kontrayan pêk tê, pêşî ji alî hêzên dewletê yên fermî ve têne dorpeçkinin ku, êrîşkar bi hêsanî dikaribin êrîş bikin û birevin.

Roja 11'ê Sibatê, Serokê Heyeta Dîsiplînê ya HEP'ê Mehmet Tekdağ, bi êrîşke hizb-î kontrayan hate kuştin. Kekê Mehmet Tekdağ, Alî Tekdağ di beyana xwe de, ji kuştina birayê xwe hêzên dewletê berpirsiyar digire û êrîşê wek êrîşek hizb-î kontra dinirxîne. Alî Tekdağ di beyana xwe de wiha dibêje: "Di wan sacten ku ev êrîş pêk hate de, polîs hemû riyan girtibû. Pişti ku êrîş pêk tê, esnafek bi dû qatil dikeve. Lê

polîs wî esnafî digirin û di nav mînibusekê de, nîv saet nahêlin derkeve derve. Bi-rayê min ji alî welatparêzan ve radikine nexweşxaneyê. Dû re em ji çûn, lê polîsan nehişt ku doktor bêne ser birayê min, nehiştin ku em bi balefirê bibin bajarekî din ji û birayê min bi vî awayî mir. Divê em li mirrovê xwe xwedî derkevin. Ger em li welatparêzan xwedî dernekevin, dê dor bê ser me ji."

Cenazeyê Mehmet Tekdağ roja şemiyê bi beşdariyeke girseyî hate binaxkirin.

Li navçeya Mêrdînê, Dêrika Çiyâyê Mazî ji, ji ceyî malbatê 2 kes bi êrîşke hizb-î kontrayan hatin kuştin, 2 kes ji birîndar bûn. Hizb-î kontra li ser riya malê êrîşî Şevket Azîzoğlu û zarokên wî kirin. Di vê êrîşê de, Azat (15) û

Vedat (25) Azîzoğlu mirin, Şevket û kurê wî yê din Sedat ji birîndar bûn.

Roja 16.2.1993'an li Batmanê, Taxa Huzurê Vahdettin Bagli (19) bi êrîşekî birîndar bû. Eynî roj li Taxa Yeşiltepe Abdulkadir Bulut (26) hate kuştin. Li Taxa Karşıyaka ji, Mehmet Beşîr hate birîndarkirin.

Êrîşen kontrayan li Nîzamettin Toğuc roja 17'ê Sibatê bi êrîşke kontrayan birîndar bû. Abdulmecit Toğuc (27) di mînibusâ xwe de û ji paş ve hate birîndarkirin. Êrîşkar weke her carî di bin kontrola polîsan de reviya.

Li aliyê din, li Taxa Abdulkadir Paşa, Nurettin Doğan û M. Emîn Doğan bi êrîşâ hizb-î kontrayan tene kuştin. Pişti vê bû-

yerê xelk bi pey kontrayan dikeve. Ji van kontrayan 2 kes xwe davêjin mala Mele Hesen ku ew ji endamekî hizb-î kontrayan e. Xelk, der û dora malê digire, lê pişti bi demekê, mînibusâ ke polîsan tê û van herdu kesan xelas dikan û bi xwe re dîbin.

Birayê Mebûsê HEP'ê Nîzamettin Toğuc roja 17'ê Sibatê bi êrîşke kontrayan birîndar bû. Abdulmecit Toğuc (27) di mînibusâ xwe de û ji paş ve hate birîndarkirin. Êrîşkar weke her carî di bin kontrola polîsan de reviya.


LI DÎLÜKÊ HIZB-Î KONTRA

Dewlet, ji salekê ve ye, li Dîlûkê (Entab) lez daye birêxistinkirina Hizb-î kontrayan. Li hin taxên Dîlûkê, endamên hizb-î kontra êrîşî welatparêzan dikan.


Ji salekê ve ye ku 4 welatparêz ji alî vê hêzê ve hatine kuştin. Di nav kuştian de Serokê HEP'a Dîlûkê A. Samet Sakik ji heye. Hizb-î kontra, li taxên ku lê dijin de, propagandaya xwe vekirî dimeşînin. Li gor agahiyê gihiştine me, navê ên ku birêxistiniya hizb-î kontrayan didominin ev in: Siddik Aslan, İbrahim Şen, Hıfsullah Sülük, Kerem Turan, Metin Çakır, Şeref Çakır, Selim Aslan, Nurî Aslan, Fadil Aslan û Murat Aslan. Ji derveyî Dîlûkê ji, gelek kes tê û diçin malen van kesan. Plaqayê erebeyen ku tê û diçin ji ev in: 27 KV 842, 27 KN 320 û 49 AR 007. Ev kesen kontra di ci-vîn û dawetên xwe de, sonda kuştina welatparêzan dixwin û bi desteka dewletê faliyeten xwe didomînin.

Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr ji HEP'ê îstifa kirin. Serokê HEP'ê Ahmet Türk daxuyaniyek belav kir:

'Xwîna şehîdan li erdê hiştin û çûn'



Mahmut Alinak



Muzaffer Demîr

Navenda Nûçeyan- Roja 19'ê Sibatê mebûsen HEP'ê Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr îstifa kirin. Îstifaya wan wek surpriz nehate dîtin, ji ber ku ji demeke dirêj ve ye ev herdu mebûsan behs û hâziriya îstifakirinê dikirin.

Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr di daxuyaniya xwe de herdu mebûsan wek tirsonek, derewkar û nedurust dinirxîne û súcdar dike.

weke partîyeke xwespêrê sistêmê."

Serokê Partiya Keda Gel, Ahmet Türk pişti îstifakirina Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr daxuyaniyek da çapemeniyê.

Di daxuyaniya xwe de herdu mebûsan wek tirsonek, derewkar û nedurust dinirxîne û súcdar dike.

Ahmet Türk roja 19'ê Sibat du-sê saet pişti îstifakirina Alinak û Demîr bersiva daxuyaniya wan da. Di daxuyaniyê

de dîtinên xwe û HEP'ê bi kurtî wiha tîne ziman. Îstifaya Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr ji bo me ne surpriz bû, lê mixabin sebebê îstifakirina xwe berevajî kirine û rasiyê nabêjin.

Di daxwaznameya xwe ya îstifayê de kêmasyen ku di şexsiyeta wan de hene, wek ên me dane xuyakirin. Bi vî awayî ji, sebebê îstifakirina xwe dixwazin vesérin. Di daxwaznameyê de dibêjin: "Hinck rayedarên HEP'ê yê Navendê bi hêza gelê xwe bawer nekirin, nexwestin bawer bîkîn." Goya rayedarên HEP'ê rî li ber muhalefeta demokratik a gel girtiye. Idîa dîkin kesî guhê xwe nedayê peşniyaren wan ên afirandina HEP'eke mezin. Û dibêjin, "HEP bûye partîyeke xwe-spêr a sistemê".

Alinak û Demîr baş dîzin ku HEP, çîma ku bi gelê Kurd ê bindest re bû, ji ber wê yekê herdem bûye hedefa êrîşen sistemê."

Ahmet Türk gotinên xwe

wiha didomîne: "Partiya Keda Gel, heta iro 43 şehît dane (ew kesen sempatîzanê HEP'ê ne tê de ne). Van herdu mebûsan di demeke ku îhtiyaciya gelê me bi hêzeke rêxistinî hebû, xwîna şehîden me li erdê hiştin û revyan û di ser re ji sebebê reva xwe bi awayekî durust neanîn ziman. Em ji tu kesî re bi

kotekî nabêjin: "Werin mucalede bikin. Em dixwazin ku kesen bi bawer werin mucalede bikin. Em bi Mahmut Alinak û Muzaffer Demîr re demeke dirêj xebitîn. Me dixwest û hêvî dikir ku bêyî lîstikên basît ên exlaqî, derdên xwe ji me re bianîna zîmîn û bi wî rengî îstifa bikirana. Dê me ji ew fêm bikirana."

Li Ixdirê lîstikên dewletê

Dewlet, li Rewanê (İxdir) ji bo şerî Azerî û Kurdan zemîn amade dike. Azeriyê li Rewanê, ji demekê ve ye li hember Kurdan êrîşan pêk tînîn. Bi daxwaz û rînîşandana dewletê, hêzeke kontra di nav Azeriyan de tê birêxistin. Ev hêz, bi destûra dewletê çekên giran bi dest xistiye û cih bi cih van çekan li hember Kurdan bi kar tîne.

Li gor rewşa iro xuya dibe ku, dewlet di nav Kurd û Azeriyan de, li du şereke giştî digere. Kurden herêmê navek li van kesen êrîşkar daniye. "Azerî Kontra" ji demekê ve ye, Kurdînan bi hêsanî li kuçeyan bigerin û evaran ji Azeriyê fâsist êrîşî Kurdan dikin.

Roja 7'ê Sibatê li gundê Rewanê Melekî, xortekî bi navê İbrahim Ağgün, ji alî Azeriyan ve hate kuştin. Ev xor li gundê Azeriyan şivanî dikir û weke miroveki welatparêz di hate nasîn. Hêzên dewletê her çiqas pêşî qatilan girtin binçav ji, dû re ew serbest berdan. Ev ji, bûyeren Batman û Farqînê tîna bîra mirov. Dewlet bi vî awayî dixwaze di nav Azeriyan de riya Kurdujiyê veke.

PÊNÛS

Amed Tigris



Ferqa Tîmûrê Leng û Silêman Demîrel

Di dema Tîmûrê Leng de Tirkan ordiyeke xwe ji kesen bê bav pêk anije. Yanî ew zarokên ku ne bavêwan, ne diya wan hebûn ew di sêwîxanan de xwedî dikirin. Ji biçûkbûyînê ve di perwerdehiya leşkerî de derbas dikirin. Karêwan kuştin, şewat û talan bûn. Leşkerên Tîmûrê Moğol ji wan kesen piç pêk hatibûn. Ew leşkerên wiha yêbê bav û bêdê, di qışleyên leşkeriyê de, di perwerdeyên barbariyê de di-hatin derbaskirin. Bi kesê wiha re ne hezkirin û dilovaniya dê û bavê, ne rehm û tırsa Xwedê û ne jî insaneti hebûn. Berevajiyê wê dilê wan bi kîn, intîkam, kuştin, talan û şewitan-din tijî bûn. Ji leşkeran kêzêde barbarî û wehsetî pêk baniya, ew ritbe û derece digirtin. Bi kurtasî kesen sadîst û barbar her mezin dibûn, dibûn paşa, dibûn serlesker.

Iro jî rewşa leşker û tîmîn Tîrkîn li Kurdistanê wek dema Tîmûr û Yenîceriyên Osmanî ne. Pirraniya wan mirovîn sadîst, pêxwas û serserî ne. Kesen bêkar, bêmal û bêxwedî ne. Li Kurdistanê di operasyonan de xwîn dikeve çavêwan êrîş dîbin erd kal, pîr, zarok û jinan.

Di dema dewleta Alî Osmanî de jî, ev edet û sîstema leşkeriya Tirkan hat domandin. Rengekî din dan wê sîstema xwe ya xwînxwar. Li ser navê musulmantiyê leşkerên Alî Osmanî Ewrû-payê dagir kirin. Her cihênu ku dagir kirin, xelkênu wê bi barbarî kuştin. Tecawuzê jîn û keçen wan kirin. Welatêwan talan û wêran kirin û bi xwe re anîn Stenbolê. Di encama destdirêjiyê jînen Ewrûpa de, ew zarokên ku ji leşkerên wan çedibûn di sêwîxaneyên xwe de xwedî dikirin û paşê ew dianîn qışleyên Stenbolê di Yenîcerî Ocaxî de, di perwerdeya leşkerî û İslâmî de derbas dikirin. Gelek paşa û qumandarên Osmanî ku, di dîroka wan de bi nav û deng in, qeremanên ji van ên bê bav, Ewrûpî ne. Paşê dîsa ew dişandin Ewrûpa û Efrîqa ji ber ku xelkênu wan deran bikujin û welatêwan talan bîkin. Vê dagirkeriyê, barbariyê û talanê li ser navê İslâmîyetê dikirin. Ji ber wê yekê navê Tirkan ji wê rojê ve heta iro, li Ewrûpa bi barbarî tê naskirin.

Iro jî rewşa leşker û tîmîn Tîrkîn li Kurdistanê wek dema Tîmûr û Yenîceriyên Osmanî ne. Pirraniya wan mirovîn sadîst, pêxwas û serserî ne. Kesen bêkar, bêmal û bêxwedî ne. Li Kurdistanê di operasyonan de xwîn dikeve çavêwan, êrîş dîbin erd, kal, pîr, zarok û jinan. Dest davêjin mal û namûsa xelkê me. Mal, nefeqe û qûtên wan tevlîhev dikin. Bi dehan, bi sedan gulle di-barînin. Benzîn li xaniyan dikin û agir berdidine wan. Jin û zarokan bi xanî ve dişewitînin. Wek agirê Newrozê li meydanêndi gund agir dadidin. Dest û lingêndi Kurdish girê didin û diavêjin nav êgir. Demîrel û Înönü jî, li Ankarayê derewêndi demokrasiyê lê mirovan dikin. Gotineke Kurdish heye û dibêjin, "Xuyêñ şîri heta pîri." Yanî mirov exlaqê xwe ji biçûktiyê heta kal û pîrbûnê jî didomîne. Zû bi zû terka wî nake. Ev xuy û exlaqê xwe ji dema ku li Asya Navîn bûn û heta niha didomînin. Ji dema Tîmûrê Leng heta niha bi sedan sal derbas bû, lê tu ferqa leşkerên wî û yê Siloyê Beg tune. Yek ferq ew e ku, Tîmûr hezar sal berî niha digirtin ser Kurdistanê, lê Demîrel iro dagir û talanê dike. Tîmûr, siwarê hespê xwe yê yaxiz û di dest de şûr û mortal hebûn. Demîrel siwarê tanqa Alman û helikopterên Amerikan e. Tîmûr ji rojhilat ve dihat Kurdistanê, lê Demîrel ji rojava ve tê.

Murathan Mungan di "Mahmud û Yezîda" de li ser evîna xorhekî musulman û keçekî Yezîdî diseke

Kirîvê nizanim gunehê min û te ci ye?

Di "Mahmud û Yezîda" de kîmâniyek bala me kişand. Gundî wek gundiyyen Anadolê bi Tîrkî diaxivin. Gundiyyen herêma ku bûyer lê derbas dibe, bi Tîrkî nizanin. En ku zanibin jî wek gundiyyen Tîrk naaxivin. Ji vê girîngtir jî, di daweta Kebîk de stran û klamên bûkê bi Tîrkî têne gotin. Ev motîv, ji listikê re hinekî biyani tê.

A. Keskin

Erdînîgara (coğrafya) Kurdistanê bi xeml û reng e. Li ser erden welatê me çiqas medeniyet bi dar ketine û veşikiline! Çiqas gel bi medeniyet û çanda xwe ve li ser vî erdî jiyan. Iro jî vê dîrokê ci maye?

ÇANDEKE WINDABÜYİ

Mirovîkî li Kurdistanê, li hêla Botanê, Behdînan û Serhêde bigere wê bibine ku, Yezîdî, Ermenî, Asûrî (Suryani), Ereb û Kurd bi hev re dijîn. Bi hev re dijîn lê, her yek adet û toreya musulmanan li hemberê wê ya Suryaniyan (filehan), li aliyeke Ereb, li aliye din Kurdistan Yezîdî, Kurdistan Musulman, Ermenî û hwd... Li ser van babetan lêkolînên zanyarı, sosyolojîk heta niha zêde çenebûne. Berhemêvan civakan ên edebî bêhtirin di nav roman, listik û helbestan de wîndan bûne.

Nivîskarêne wek Yaşar Ke-mal, Bekîr Yıldız û Murathan Mungan, ev dewlemen-diya civaka Kurdistanê di pir-tükên xwe de bi kar anîne. Bêhtirin jî Murathan Mungan. Mungan, di çirok, listik û helbesten xwe de jiyanâ civaka Kurdistanê dihone. Edebiyata devkî, li her welatêne Rojhilat û Kurdistanê geleki bi pêş ketiye. Li ser evîna qîz û xor-têne Yezîdî û musulman gelek klam, stran û çirok hene di edebiyata Kurdi ya devkî de. Wek Kirîvê (Kirîv): "Kirîvê nizanim gunehê min û te ci ye/ evqas rê û şop li min û te girtiye/ Ji ber ku ez musulman im, tu jî êzîdiye Kirîv..."

"MAHMUD Û YEZÎDA"

Murathan Mungan jî, di "Mahmud û Yezîda" de (Mahmud ile Yezida, We-sanîn Metis) li ser evîna ke-

cke Yezîdî û xorhekî musulman diseke. Bûyer li dora Mêrdînê derbas dibe û wek Apê Abid jî dibêje di "demeke xirab" de: "Dayîk kurê xwe, axa gundiyye xwe nizane. Her tişti ji hevdî vejetiye. Hikmî tiştekî di çavêtu kesi de nemaye. Ci dibe, tu kes ji me fêm nake. Toreya gundan hatiye guhertin. Gund ne gundan berê ne. Xwêya nan a berê nîn e, genimî simbil ê kevn. Bêhn ji her tişti tê. Ava çem, axa erdê, tifika malê. Û du dibêji qey bêhn bi me tevan ketiye. Bêhn ji me tê. Wek laşekî, giran bûye serê gund. Li ser gund tim ceyîn ewr. Û tu dibêji qey lanet li me bariye. Lanet li gundan bûye, erdan, axan."

"Û tu dibêji qey em hemû di goristanan de dirizin."

Di demeke wiha de Mahmud û Yezîda hev dibîn, dil dikevin hev. Çil (40) rojî hev dibîn. Her roj keziyeke Yezîda dihone Mahmud. Dixwaze Yezîda birevîne lê, evîna wan jî lanetkirî ye. Li herêmêtu kesi wan qebûli ba xwe bîke nîn e.


GUNDÊ KEFENKIRÎ

Di nav gundan musulman û Yezîdiyan de, pirsgirêk erdê derdikeve. Havvas Axa gundiyan dixapîne. Ew jî rádihejin tivingen xwe û dora gundê Yezîdiyan xêz dikin: "Her kî Yezîdiyekî bêxe nav daîreyekê, yê ku daîra xêzkirî heta bi destê xwe xera neke, ew Yezîdî nikare ji nav daîre derkeve." Pişti xêzkirina daîreya li dora gund, tu kes ji malan dernakeve. Gund bi kefeneke reş tê nuxumandin.

Apê Abid dibêje: "Heyfa Yezîdiyan heyfa şeytân e. Heta cehnemê muhleta wê heye."

TOREYA EVÎN Û MIRINÊ

Heyfa wan li Mahmud di-kele. Destê wî yê rastê jê di-



Mahmud û Yezîda

kin, bi rimê eşîri vedikin û ji dêla tixûbê gund, di erdê de diçikin. Yezîda Mahmud di wî halî de dibîne. Daîreyekê li dora xwe xêz dike: "Ev heqê min û evîndariyê ye." Diya wê Raşa Xatûn lê vedigerine: "Ev çawa heqê evîndariyê ye ku, bi mirinê tê cih Yezîda?" Yezîda bersiv dide: "Ev çawa tote ne ku, mirinê bi evînê didin dayê?"

Herkes, gundî tev de li serê Yezîda kom dibin. Diya Mahmud, Eyşan Xanim jî tê: "Mezheb, dîn û cinsiye ta evînê nîn e. Dê em toreyen xwe ji nû ve bînîn ber çav. Û êdî bila egîdîn wek Mahmudê min, nemirin, xezalêne wek Yezîda ri hedin."

Roja çîlî temam dibe: "Iro roja cejnê ye. Û evîndarê min li benda min e. Çem buhurand, çiya qelişand tu hatî ba min Mahmud. Min tora xwe quliband, mirin qelişand, tême ba te qurban." Yezîda pişti kezî û porê xwe vedike dimire.

MOTİVÊN BIYANI

Di "Mahmud û Yezîda" de kîmâniyek bala me kişand.

Gundî wek gundiyyen Anadolê bi Tîrkî diaxivin. Gundiyyen herêma ku bûyer lê derbas dibe, bi Tîrkî nizanin. En ku zanibin jî wek gundiyyen Tîrk naaxivin. Ji vê girîngtir jî, di daweta Kebîk de stran û klamên bûkê bi Tîrkî têne gotin. Ev motîv ji listikê re hinekî biyani tê.

Hin nivîskarêne wek Tîrkî dînîvisin, çanda Kurdi ji nivîskarêne Kurdi bêhtir nas di-kin. Xwezi bi Kurdi nivîsibûna!

Nameya nivîskar Mehmet Emîn Bozarslan ji UNESCO re:

'Bila 1995 bibe sala Ehmedê Xanî'

Ez daxwaz û hêvî dikim ji UNESCO ku sala 1995'an bike bi navê "Sala Ehmedê Xanî û Mem û Zin". Bi vê yekê jî UNESCO dikare alîkariya kultura Kurdî diyar bike." Bi vê yekê diqede nameya M. E. Bozarslan: "Ez bi hêvî me ku UNESCO vê biryara dîrokî bistîne."

Serwisa Çandê- Nivîskarê ku Mem û Zinê ji tîpén Erebî wergerandiye tîpén Latînî M. E. Bozarslan, di 21.3.1992'an de ji UNESCO're nameyek şand. Ev nameya girîng bi giştî li ser destana Mem û Zinê, xebatêni ji bo wê û ji bo xebatêni salvegera 300 saliya Mem û Zinê ye.

Di nameyê de M. E. Bozarslan, pêşî bi kurtî li ser jiyan û xebatêni xwe yên edebî û çandî radiweste: Çapkirina Mem û Zinê, berhevkirova kovar û rojnameyên Kurdan ên berê û bi ci sedemê hatiye Swêdê hwd. Dû re qala pêvajoya çêbûna Mem û Zinê û naveroka wê dike. Piştî vê bi sernavê "Xebatêni minê li ser Mem û Zin" ku çima û çawa Mem û Zinê ji tîpén Erebî wergerandiye Latînî, kîjan salê û li ku derê bi Kurdi çap bûye, dû re çawa qedexe bûye. Û filma Mem û Zin tîne zimêni û wiha dom dike. "Ez û navbera salên 1992 û 1994'an de bixebitim, hêviya min ew e ku, ez pêşgotineke dirêj li dora 100 rû-


peli bi şirovekirin binivîsim. Li ser destana Mem û Zinê û nivîskarê wê Ehmedê Xanî."

M. E. Bozarslan di nameyê de li ser girîngiya Mem û Zinê ji disekine û dibêje: "Mem û Zin di serê kultura Kurdî de ye. Kaniyekî pirr dewlemend e, ji dîroka kultur û civaka Kurdî ya kevn e. Her wiha Mem û Zin ji Kurdojîyên Rojava re û ji rojhelatnasên ku li ser kultura Kurdî û hunera Kurdî lêkolîn dîkin re kaniyekî giranbuha ye." M. E. Bozarslan tîne zimêni ku sala 1995'an salvegera Mem û Zinê ya 300 salî ye. Û dixwaze vê bîranînê li Ewrûpa, li Amerîkayê, li Qanadayê, li Kurdistanê bi şahiyan, bi kongre, civîn, semîner û hwd. pîroz bikin.

M. E. Bozarslan di bin sernavê "Dîtina UNESCO li ser kultura Kurdî" de rewşa Kurdi ya li Tirkîyê, qedexekirina zimanê Kurdi, erîs û rîlibergirtinê Komara Tirk ên li ser zimanê Kurdi, çand û hunera Kurdi tîne zimêni. Û gazinêni xwe ji UNESCO dike, ji ber ku

carekê ji li dijî politikayê TC ên nîjaderrest nesekiniye û ew carekî ji protesto nekiyire. M. E. Bozarslan ditin û xwestina xwe ya herî girîng di bin sernavê "Xwestinek ji UNESCO" tîne zimêni.

"Em Kurd neteweyekî ku bê dilê xwe hatine parçekirin û di vê sedsalê de em bindest bûne. Welatê me heye, lê dewlet nîn e, hebûneke me ya neteweyî heye, li cîhekî me yê (resmî) di nav neteweyen cîhanê de nîn e. Çand û kultura me heye lê, nûner di UNESCO de nîn e û em diwxazin ku rîexistina cîhanî ya kulturî hevalbendiya me ji bike. Lewre ez



Mehmet Emîn Bozarslan

daxwaz û hêvî dikim ji UNESCO ku sala 1995'an bike bi navê "Sala Ehmedê Xanî û Mem û Zin". Bi



Ehmedê Xanî

vê yekê jî UNESCO dikare alîkariya kultura Kurdî diyar bike." Bi vê yekê diqede nameya M. E. Bozarslan: "Ez bi hêvî me ku UNESCO vê biryara dîrokî bistîne. Sipasiya min ji we re ji niha ve."

Bi çavekî rexnegirî Nûdem

Zana Farqînî

Kovara Nûdem a hunerî, wêjeyî û çandî, di jiyana xwe ya weşanê ya neh mehî de, hejmara xwe ya çaremîn ji derxist. Nûdem kovareke xwerû bi Kurdi ye û li Swêdê jiyana xwe ya weşanê didomîne.

Di vê hejmara Nûdemê de nivîsêna bala mirov dikişîne hin ji wan bi kurtî ku em bibêjin ev in: Di stranêni Kurdi de Navçeyeke Erotîk: Memik. Ev nivîsa Rohat li ser klam û stranêni Kurdi ku tê de behsa pêwendiyêni jin û mîr tê kirin, hatiye amadekirin. Rohat bi taybeti di stran û klaman de, li ser rola memikan disekine û nivîsa xwe bi 62 çavkaniyan xurt dike. Mirov dikare bibêje ku, ev xebata han di warê xwe de cara pêşîn e tê kirin. Evîneke Melodramîk: Ev nivîsa Hesenê Metê ye ku bi xebatêni wergeriyê ji tê nasîn. Hesenê Metê di vê nivîsa xwe de serpêhatiya kal û pîrekî bi zimanekî wêjeyî dihone û vedibêje. "Dara hinarê a li ser gîrik" ji, ji aliye Dr. Poloço ve ji roman Yaşar Kemal hatiye wergerandin. Roman bi navê xwe yê Tirkî "Höyükteki Nar Ağacı" ye. Werger bi zimanekî hêsan û xwerû ye.

Swêd, Alfred Nobel û xelata wî, navê nivîsa berpirsiyare kovara Nûdemê Firat Cewerî ye. Cewerî, di vê nivîsa xwe de li ser taybetiyêni civaka Swêdî û Alfred No-



Nûdem, Hejmara: 156 rûpel

bel disekine. Zeynelabidîn Zinar di vê hejmara Nûdemê de bi xwendevanan Eli Herîri dide nasîn, ku cara pêşîn bi zara-vayê Kurmancî berhem nivîsandiye. Her wisa hîn ev nîrxandin ji bo Eli Herîri derbasdar e.

Lokman Polat bi nivîsa xwe ya bi "Danasîna Kovaran" kovar û rojnameyên ku li bakurê Kurdistanê bi awayeke fermî

tên belavkirin, bi me dide nasîn. Ehmed Huseynî bi hélpêsta "Payiza Çiyan....Bûka Agir" bala xwendevanan dikişîne ser xwe. Helbesta Ferîkê Usiv, "Tu çûyi, çûyi", Medenî Ferho, "Li welatê min", "Eskekê Boyîk", "Kengê", Medenî Ayhan bi "Strana Mezra Bota" di vê hejmarê de cih girtine.

Nûdem di vê hejmara xwe de cih daye jînenîgariya nivîskarêni xwe. Di hejmarekî de cihdana jînenîgariya heft-heşt nivîskar ne tiştekî xweş e. Dibe ku di hejmarekî de mirov cih bide danasîna nivîskarek an du nivîskarê xwe.

Bi rastî di kovara Nûdemê de tiştek din ji dêhn û bala mirov dikişîne ku ew ji çewtiyên rîezimani û tîprêziye ne. Wekî din ji, hê ji zimanekî hevgirti di Nûdemê de rûnenîstiye. Mînak; peyva stran bi se teşeyî (awayî) derbas dibe. Bi teşeyâ "sitran", "sitran" û "stran". Peyva wisa hem "wusa" û hem ji "wîsa", peyva kûr hem "kwîr" û hem ji "kûr" û hwd. Ez naxwazim çewtiyên rîezimani, tîprêzi û rastnîvisi di vir de, hemûyan, ber bi çav bikim.

Îro ji bo me Kurdish di warê nivîski de pêwistiya herî mezin, standartbûna zimanekî rûniştî ye. Divê vê rewşê, redaksiyonen kovar û rojnameyân ji bîr nekin.

Di gel van kêmasyan kovara Nûdem, ji kovarêni hunerî, wêjeyî û çandî, kovareke hêja ye.

"Nûbihar" derket

Kovara "Nûbihar" hejmara xwe ya çaremîn derxist. Ev kovara çandî, hunerî edebî û olî ku ji mehî carekê derdikeve, di hejmara xwe ya dawî de bi giranî li ser pirsgirêka Kurdi sekiniye. "Nûbihar" zêdeyî deh rûpelên xwe vegetandiye ji bo "Lêpirsîna pirsgirêka Kurdan". Di vê lêpirsînede, bi firehi ditinêni Firat Cewerî, Yilmaz Çamlîbel, Süleyman Çevik hatiye standin.

Di vê hejmara Nûbihar de tişte zêde bala me kişan, du hevpeyvînêni bi Sabah Kara re bûn. Ev herdu hevpeyvîn ji berê yek di Özgür Gündemê de, ya din di Azadî de bi Tirkî derketibûn. Jixwe hûn zanîn Sabah Kara ji Berpirsiyare Giştî yê "Nûbihar" ye.



Berga kovara Nûbihar

Welatparêz, zanyar û helbestvanê hêja:

SEÎDÊ ÎBO

Roja 18.01.1991 li paytexta Ermenîstanê bajarê Rewanê, S.Îbo bi gulleyeke xayîn û rûreşan, bi destê hêzên reş û tarî ve hate kuştin. Bi kuştina welatparêzê mezin S.Îbo, gelê me lawekî xwe yî herî naskirî û hezkirî wînda kir. Bi bihîstina vê nûçeyê dilsarî û reşîyeke mezin xwe girê da. Hemû kesen mirovperwer li dijî vê bêdadiyê nefreteke mezin nîşan dan.

R. Cizre

Seidê Îbo, roja 08.05.1924'an li Ermenîstanê, navçeya Işmiyatînê, gundê Qarxuna Jorîn (Niha Cararat) hatiye dinê. Malbata Seidê Îbo mîna hemû Kurdîn welatên Sovyeta berê, ji ber zîlm û zorda-riya Roma Reş, revîne û li Ermenîstanê bi cih û war bûne. Lewma hemû gelê me yê li van welatan dijî, di dilê xwe de kin û nefreteke mezin li dijî dewleta Tirkîyê hildigirin. Tim behsa heyfa bav û kalêñ xwe dikin, li rî û metodê vegera welat dipirsin. Îro, bi hebûna şerê serxwebûnê û rastiya serokatiya gel, dilê wan germ dibe û bi eşkere diyar dikin ku, roja vegera wan nêzîk bûye. Veger û qedera xwe bi zanebûn, bi şerê gerilayêñ Kurdistanê ve girê didin.

Seidê Îbo, di gelek waran de, xwedî zanebûn û huner bû. Ew hem ji yek doktorêñ zarokan ên herî naskirî di nava temamiya Sovyete de bû, hem ji weke nivîskar û helbestvanêkî girêdayê gel û rastiyê bû. Seidê Îbo lawekî gelê me yê jîr, zana, fedekar û welat-parêzîkî mezin bû. Ji bo pirsêñ Kurd û Kurdistanê qet tîrs nas nedîkir. Di her demê de, bi tenê rasîtiyê diparast. Li ser fêmkirina pir-san gelekî radiwest û bûbû weke çavkaniyeke moralê, ji bo gelê me yê li Ermenîstanê dijî. Timî, di rojêñ zor û giran de, li wan dibû xwedî, rî şanî wan dikir, li ser şin û şahîyan herdem amade bû. Seidê Îbo li dijî mixenetiye, derewan û durûtiyê tim ser dikir û digot: "Bila kes hewl nede gelê xwe bi-xapine. Di dilê mirov de, ci heye, bila wê bibêje."

Tevî hemû zoriyêñ jiyanê hêviya bavê Seidê Îbo ew bû ku, Seid bixwîne, diplomayêñ bilind hilgire û xizmeta gelê xwe bike. Seidê Îbo, li hêviyêñ bavê xwe xwedî derket. Di nava nexweşî û zoriyêñ jiyanê de, bi pirsa hebûna Kurdan ve, mezin bû.

Lewma hîna di xortaniya xwe de, dest bi nivîsandina helbestan kir. Ji wê demê ve gihiştibû vê ba-

weriyê: "Girîng e Kurd hebûna çanda xwe biparêzin. Zimanê xwe xweyî kin, pêşve bibin. Hemû pirsêñ dîroka xwe ronî, zelal bikin." Vê pirsê, li ba S.Îbo girêdan û serbilindiyeke mezin bi zimanê Kurdi ve, pêşde anî. Ew, di helbesteke xwe de, der mafê ziman de, wiha dibêje:

Kî zimanê xwe bîr bike
Şîrê dayîka xwe bîr dike.


Seidê Îbo, di sala 1957'an de, Üniversiteya Rewanê, Fakulteya Doktoriyê kuta kir. Dû re çend salan li gundêñ navçeya Spîtakê doktorî kir. Di wê demê de ji dest bi nivîsandina helbest û kurteçirokan kir. Sala 1962'an li Moskoyê bû kendîtâtê zanyariya doktoriyê û dû re di sala 1970'î de bû professorê doktoriya zarokan. Di warê doktoriyê de, du sed xebatêñ S.Îbo hene. Gelek tiştîn nû bi xwe derxistîne. Weke zanyarekî bilind hatiye naskirin. Ew endamê Komeleya Doktorîn Zarokan New-York û endamê Komeleya Doktorîn Zarokan ê Ewrûpa bû.

Seidê Îbo, heta sala 1988'an û çar pirtükîn helbestan weşandiye, ew jî ev in: Qurna Min (1963), Bîst Salê Dinê (1970), Şînem (1975) ev pirtükî diyarî şerî rizgarîya Kurdan kiriye. Azadî (1988), ev pirtükâ wî ya dawiyê bû. Ew di dawîya vî pirtükâ xwe de, behsa xewna xwe dike, xewna dîtina Kurdistanê serbest û azad:

Lê dûr nîn e nadira şems
Bûyî wetenê me yî bindest
Hezara got: "Ber bi herî"
Seid bira xema neke
Xewna te xweş wê bê serî
Ber deriyê roja rengîn
Kurdistanê rabe ser zîn.

Di helbestêñ S.Îbo de, mirov rastê hunermediyeke bilind tê. Ew dixwaze bi helbestan ruhê mirovan paqîj bike. Hîna di sala 1948'an de, çend helbestêñ wî di pirtükîn dersê yîn zimanê Kurdi de hatine çapkirin. Di gelek kovar û rojnameyan de jî helbest, serpêhatî û çirokîn wî hatine weşandin. Gotinêñ Kurd û Kurdistanê tim li ser zimanê wî bûn. Di

Sed heyf û mixabin ku, roja 18.01.1991 li paytexta Ermenîstanê bajarê Rewanê, S.Îbo bi gulleyeke xayîn û rûreşan, bi destê hêzên reş û tarî ve hate kuştin. Bi kuştina welatparêzê mezin S.Îbo,



Prof. Dr. Seidê Îbo di 18.1.1991'an de li Yerivanê ji hîla "hêzên" tarî ve hate kuştin.

Wêne: Arşîva Welat

gelê me lawekî xwe yî herî naskirî û hezkirî wînda kir. Bi bihîstina vê nûçeyê dilsarî û reşîyeke mezin xwe girê da. Hemû kesen mirovperwer li dijî vê bêdadiyê nefreteke mezin nîşan dan.

S.Îbo, bi bîr û baweriyyê xwe yîn zelal, ronak û demokrat, ji hîla hemû mirovîn baş ve dihate hezkirin. Lewma jî, di meşa cendekê (cinyaz) S.Îbo de nêzîkî 10 hezar mirov beşdar bûn û meşîyan mîna Kurd û Ermenî.

Li ser goristanê, di dema binaxkirina cendekê S.Îbo de gelek mirovîn demokrat û welatparêz ên Kurd û Ermenî xeber dan. Di serî de, Serokê Enstituya Doktoriyê ya Rewanê Birêz Vîlén A-kopyian, di dengkirina xwe de got:

"Şermîyeke gelekî mezin e ku zarên Kurdan yîn hîja mîna Seid li ser axa Ermenîstanê werin kuştin." Dû re helbestan û nivîskarîn Kurda, Fêrikê Ûsiv, Wezirê Eşo û Dr. Karlêne Çaganî dengkirin û parçeyen helbesten xwe der mafê S.Îbo de xwendin.

Di dawiyê de jî, Mamoste Çerkezê Reş dest bi dengkirinê kir û got:

"Erê em Kurd in. Heta dengê me heye emê bibêjin em Kurd in. Bila baş were zanîn ku, ew desten

reş, desten gemar, ew gulle ne tenê xwestiye berde ceynika S.Îbo, lê belê, xwestiye berde ceynika Kurd û Kurdistanê. Kurd hefta dinya hebe wê hebin û zindî bimînin..." Çerkezê Reş tesireke mezin li serê hemû mirovîn hazır kir.

Ev e, du sal in, edî S.Îbo çûye ser heqîya xwe, lê li welatê me gelek guhertin û pêşveçün pêk tê. Hêzên reş û tarî edî direvin û paş ve dikişin.

Berbanga serxwebûnê nêzîk bûye. Kurdistan edî ne xewn e, li ber çavan xuya dike. Gerîlayêñ me her roj heyfî ji neyaran digirin. Bê guman e ku, xewna S.Îbo li ser a-xa welat pêk tê. Bila dilê zanyar û welatparêz hîja rihet be. Dem dema berê nîn e. Kurd edî ne belengaz û bêxwedî ne. Kurd edî bûne xwedîy qedera xwe.

Em wiha bawer dikan, rastî nikare were veşartin. "Rim di têran de, wîndâ nabin." Rastî wê eşkere bibe, rûçikê hêzên reş dê xuya bibe, mirov qujîn veşartî ji wê ber-siva xwe bigirin.

Di bîrânîna duyemîn a çûyîna Mamoste S.Îbo de, bila serê gelê Kurd sax be, bila baweriya Meta Nazê, Meyane û Ezîz xurt be. Serkevtin ya rastî roniye ye.

Rewşenbîr û gel: Çi têkilî ci nêzîkbûn?

Werin! Em hemû rewşenbîrên Kurd, ji bo şoreşa xwe, ji bo serxwebûn û azadiya welatê xwe, bibin mekanîzmeyeke şoreşger. Li derveyî şoreşê em çiqas zanyar û şareza bin jî, tu rûmet ji me re nîn e. Ger em rojê li ser deh çapxaneyan jî bigerin, dîsa em nikarin bêyî xwîna şoreşê jiyan bibin!

Şoreş Dicle

Rojnamevanek ji afirînerê romana Dayîk M. Gorkî dipirse: "Hûn dikarin ji kere ma xwe re bi me bidin nas-kirin rewşenbîr kî ye? Çi têkilî di navbera wî û gel de heye? Mirov dikare ji kî re bibêje rewşenbîr?" Zanyarê nirxdar Gorkî pirsa wî di-bersivîne û dibêje: "Kesê ji her kesî bêhtir nêzîkî derd û êşen gel, nêzîkî ahîn û axînên gel, nêzîkî daxwaz û ar-mancê gel... rewşenbîr e. Rewşenbîr; ew mirovê ku dikare pirs-girêk û prob-lemê gel çareser bike û bibe hêviya serbestiya ci-vakê. Eger ne wisa be, çiqas xwendibe jî, di nêrîna min de nikare di nava refîn rewşenbîran de cihê xwe bigire. Ji lew re ez pîvanê xwendin nagirim, pîvan pratîk e, xizmet e, fede-karî ye..."

Werin em rewşenbîrên kurd xwe li gora gotina M. Gorkî di der barê rewşenbîran de bipivin:

Tevgera rizgariya nete-weya Kurdistan xwe gihan-diye radeyeke wiha ku, êdî amadekariyê ji avakirina meclîsa neteweyî re dike. Ji bo damezirandina artêseke neteweyî, civakeke serbixwe û azad, bajarvaniyeke mirovahiyê... Gelê me bi her a-wayî û di her warî de xwe daye ber mirinê. Mirina ji

bo afirandina civateke ku mirov bikaribe tê de mirovahiya xwe biparêze, weke dawetekê dibîne. Zarok, jîn, ducan, kal... heyâ bi mi-riyên goristanan jî, goran diqelişinîn û tevî serhildana gelî, serhildana tolhildan û serfirazîyê dibin û dibangî-nin: "An Kurdistan, an neman!"

Di aliyeke de panzer za-

tiştên din tune ne.


Ji bo vê meşa serfirazî û azadiyê, em rewşenbîrên Kurd çiqasî amade ne ku, bibin navenda tevger û bi-zavê? Em çiqas nêzîkî ger-miya şoreşê ne? Em li pêsi-ya şoreşê ne, yan li paşıya şoreşê ne? Ji bo me rewşenbîrên Kurd bersiva van pir-san gelekî pêwest e.

Teoriya bê pratîk, di fer-henga siyasi de demagojîti ye. Bi zimanê gel gevezetî ye. Kesênu ku pirr diaxivin û kêm wê axaftinê di pratîkê de pêk tînin, şirovekerên siyasi nav li wan dikan: Su-per Geveze. Mixabin super gevezeyêne me gelek in, pirr d i b ê j i n , kêm dikan.

Bi gotinê mirov dikare di rojekê de hezar carî Kurdistanê rizgar bike, dikare bi sedan caran jî, bibe împaratorê Medya. Lî dema ku pêkanîn tu-ne be, ji sedî sed super gevezetî xwe diavêje holê, cihê dax û mixa-binê ye.


Li kîleka gotinê dem, ji me kirinê jî dixwaze. Gotin û kirin bi hev re jiyan dibin, bi hev re dimirin. Ji lew re herdu jî, ji civateke serbixwe re dibin binyad û bingeh.

Werin! Em hemû rewşenbîrên Kurd, ji bo şoreşa xwe, ji bo serxwebûn û azadiya welatê xwe, bibin mekanîzmeyeke şoreşger. Li derveyî şoreşê em çiqas zanyar û şareza bin jî, tu rûmet ji me re nîn e. Ger em rojê li ser deh çapxaneyan jî bigerin, dîsa em nikarin bêyî xwîna şoreşê jiyan bibin!



AZADÎ

Abdurrahman Durre



Ewrûpa çilo dibîne?

Der heqê doza Kurdistanê de, hikûmetên Ewrûpa û gelên Ewrûpa, weke hev nafikirin. Gelê Ewrûpa ji sedî not alîkariya gelê Kurd û Kurdistanê dixwazin û destek dikan. Bi çavên insanî li Kurd û Kurdistanê mîze dikan, her wekî hemî gelên cîhanê, azadî û rizgariya gelê Kurdistanê jî dixwazin. Û baweriya wan li aliyê demokrasî û serbestiya gelê Kurd de ye.

Lê hikûmetên Ewrûpa, her wekî her tiştî, li meseleya Kurdistanê jî, bi çavên kar û zerarî dinêrin, bi dewletên ku Kurdistanê parce kirine re, peymanê wan ên siyasi, çandî, bazirganî (tîcarî) û leşkerî hene. Li gorî van peyman û tifaqan dimeşin, li karên xwe yên siyasi mîze dikan û hevûdin dixapînîn û li dû kara xwe ne.

Ger kara xwe di alîkariya dewletên Tirk, Ereb û Ecem de bibînin, alîkariya wan dikan. Ger ku bawer bikin

Roj heye ku dewletên Ewrûpa tûranîzm û faşizma dewleta Tirk ji xwe û ji cîhanê re weke talûke bihesibînin û alîkariyên siyasi û madî bidin şoreşa azadiya Kurdistanê û Kurdistaneke azad bixwazin. Lê, ne ji bo Kurd û Kurdistanê, belkî ji bo karên xwe yên siyasi, tîcarî û aborî.

Ü madî bidin şoreşa azadiya Kurdistanê û Kurdistaneke azad bixwazin. Lê, ne ji bo Kurd û Kurdistanê, belkî ji bo karên xwe yên siyasi, tîcarî û aborî.

Ev heye ku, gelên Ewrûpa dikarin li ser hikûmetên xwe tesîrî bikin û mecbûrî alîkariya şoreşa azadiya Kurdistanê bikin.

Li gor baweriya min, di demeke nêzîk de, dê ev guvaştina gelên Ewrûpa tesîra xwe li ser dewletên Ewrûpa nîşan bide. Lewre, gelên Ewrûpa ji polîtikayêن Tirkan, ên faşist û tûranîst aciz in û ji tûranîzma cenawir pirr endîşe dikan.

Bi rastî jî, ji Tirk, Ereb û Eceman gelek aciz in û ji wan hez nakin. Ji Kurdan jî hez dikan. Komeleyên Kurdan li Ewrûpa gelek xurt û berbiçav in. Li her derê Ewrûpa Kurdistan heye. Dîtin, bihistin û hîsîn min vê nîşan didin ku dê di demeke nêzîk de ev rastî xwe nîşan bidin.

Ji xwendevanê Welat re!

Sirketa belavkirinê rojnameya me belav nake.

Ji ber vê yekê êdî bi îmkanên xwe û bi alîkariya xwendevanê xwe wê Welat bê belavkirin. Xwendevanê me yên ku dixwazin di belavkirina Welat te alîkariyê bi me re bike; ji kerema xwe re bila navnîşan û telefona xwe ji me re bişînin.

Di welatê me de xweza (natur, tebiet) bi awayekî bê plan û program, tê guherandin. Armanc pîr caran raste rast çewsandina xwezayê ye. Mirovên me zêde vê guherandinê munaqeş nakin. Ji bo minak ez bibêjim: Proja GAPê çiqas hate munaqeşkirin? Li ser çiqas lékolîn hatin kirin? Di vî warî de bêdengiye xerab heye. Mirov baş dizane ku, xwezaya welatê me, roj bi roj derbêñ kûr dixwe. Gav û guherandina iro wê bi xwe re problemen ekolojik peyda bîkin. Birînê ekolojik ji rehet rehet cebar nabin.

Xebat di vî warî de nikare li benda rizgarbûna welat bisekine. Xebat ji bo xwezaya Kurdistanê divê iro dest pê bike. Tiştê ku mirov di şertê iro de karibe bike, divê bê kirin. Parastina xwezayê li welatê me karekî pîr girîng e. Ez dikarim bê mubalexe bibêjim ku, ew kar ji pîr karê din girîngtir e û hêjatir e. Ji bo minak ez bibêjim: Lewitandina ava çemê welatê me bi xwe re wê nexweşiyê pîr mezin pêk bîne. Lewitandin di vî warî de nikare bê parastin. Ji bo ci em û dewlet di vê pîrsê de nêzîkî hevûdin in? Ma gelo ev tişt mirovên me nade fikirandin? Ma gelo di vir de şeytaniyek tune ye? Ez baş dizanîm ku, rojekê wê çemê Dicle û çemê Nisêbinê li dijî mirovan û lewitandinê serî hildin! Ji ber ku serhîndan jiyan e.

Munaqeş û dîtinêni li ser xwezayê kûr û bê binî ne. Di dîroka mirovahiyê de, dîtinêni cur be cur hene. Çep û rast di vê mijarê de ji weke hevûdu nafikirin. Di felsefîya çeptiyê de parastina xwezayê heye. Marks pîr caran behsa vê yekê kiriye. Di gelek nivisên xwe de Marks wiha dibêje: "Mirov divê li gora xwezayê bijin." Xweza bi xwe xwedîyê sistemeke ekolojik e. Xerabkirin û silûkkirina sistema ekolojî nikare bibe karê mirovên çep. Ew tişt pîr vekirî ye.

Mirov di xwezayê de têkoşin dide û dijî. Ev nêzîkbûna hanê te-

Guherandina tebîetê

SEREFXAN CIZÎRÎ



sîreke pirralî li mirovan dike. Kes hene ku ji sebebîn hisî û argumenten exlakî tevger dikin û bedewbûna xwezayê diparêzin. Di xwezayê de hunermendiyê dibînin. Kes ji hene ku, ji bo mirov û mirovahiyê bi metodên zanistî li ser giranbuhabûna xwezayê diskinin. Ew kes û tevger dixwazin ku bandora xwe li ser xweza û qanûnê xwezayê pêk bînin. Hinek cereyanê fîkrî ji hene ku, dixwazin van herdu adetê (tradisyonê) fîkrî bi hevûdu ve girê bidin. Ev helwest ji, ji aliyeke ve weke pîwistiyekê tê dîtin.

Ev dîtinêni ku me li jor behsa van kir, xwedî dirokeke pîr dirêj in...

Di civaka antîk de dîtinêni mirovan li ser xwezayê, ji dîtinêni iro pîr cuda bû. Di pergala xwezayê de, ji bo kes û civata mirovan idealek didîtin. Filozofî Antîk ji vê pergâlê re digotin, "Kozmoz." Bi zimanekî din mirov dikare bîbêje;

pergala bedew û rast. Ew dîtin ji nêzîkayî ve bi dîtinêni civata Antîkî û jiyanâ wê ya kulturî ve girêdayî bû. Ilmî dermanê (Tib) ji vê dîtinê re dibû bingeh. Li gorâ ilmî dermanî ji bo gewdê (laşê) mirovan, sihhet (tendurustî), rewşa normal bû. Nexweşiya gewdê, weke ji rê derketinek, an ji bi dûr ketinek, ji cerxa normaliya xwezayê dihat dîtin. Sihhet bi xwe xweza bû û nexweş ji, dûrketina ji xwezayê bû. Hemû xebata ilmî koncentreyî (kombûn) sebebîn nexweşyan dibû. Armana ilmî ya herî mezin harmonîzékirina mirovan bi xwe bû. Pîr caran felsefa Antîk, analoji û teoriya xwe li ser bingeha gewdê zindî (bi can) ava dikir. Ji bo minak ez bibêjim; filozofî mezin Platon (Eflatun) ji dewleta ideal re digot; "Politika-yeke rewşa xwezayî." Em dikarin bi gotineke din bîbêjin; gewdê civateke ku xerab nebûye, ji rewşa xwe ya xwezayê bi dûr neketiye û

hwd.

Di dema feodalî de, ilmî skolastik hakimî memalîka mirovan bû. Filehiyê û dDêrê hemû ilm xistibûn destê xwe û armanca hemû ilm ji, teolojîk (Ilahiyyat) bû. Hemû tişt û pîrsê civakî bi sebebîn dînî ve, dihatin girêdan û ronîkîn. Dîtinêni li ser xwezayê ji, bi ideolojiya filehiyê û bi hebûn û tunebûna Xwedê ve dihat girêdan. Welatê Xwedê ku xweza bi xwe bû, bedewbûna Xwedê nîşan dida. Evqas bedewbûn û xemilanda xwezayê, weke esera Xwedê dihat dîtin. Xwedê li hemû derê hazir û nazir bû.

Bi pêşketina kapitalizmî re, pîr dîtin hatine guherandin. Dîtinêni mirovan li ser xwezayê ji hat guhertin. Menfaetîn çinê serdest û pêşketina teknolojîk dest pê kir, hevûdu temam bikin. Bi şoreşa ilmî re, zanebûnê dest pê kir; bi awayekî sistematik bibe teknolojî. Ilmî xwezayê kete xiz-

meta çinê serdest. Ji bo çinê serdest xwe dewlemend bikin, ilm û teknolojî kirin himbêza xwe. Li gor felsefeye burjûwazi, xweza ji bo mirovan bû. Lî di rastiyê xwe de ev yek, ji bo menfaeta çinê serdest, dihat gotin. Bazırganî di vî warî de dîtina herî girîng bû.

Li gor dîtinê sosyalistî ji, ku ev bi raya min dîtinek nû ye, mirov beşekî ji xwezayê ye. Armanc rehetbûna mirovan e. Kesê ku cihê xwe nas neke, rehetiya xwe ji baş nas nake. Xweza, raste rast ne ji bo mirovan e. Di nav maxlûqatê xwezayê de cihêkî mirovan bi taybetî heye. Sosyalizm li ser bingeha xwezaya materyalistî ava dibe. Lî ev cihê bi taybetî tu caran heq nade mirovan ku, cerxa xwezayê ji binî ve biguhere. Guherandina xwezayê divê li ser bingeha ekolojî û aqil bi hevûdu re bê damezirandin. Weke Francis Bacon dibêje: "Zanebûn destilat e (iktidar e). Kesê ku ne bi zanistî nêzîkî xwezayê bibe, wê mala xwe bi destê xwe xera bike. Sosyalizm dixwaze malan ava bike. Lî em baş ji dizanîn ku bi navê sosyalizmî pîr mal hatine xerakirin.


Kolonyalizm xwezaya Kurdistanê bi zanistî xera dike. Di bin navê pêşketinê de, stûnê welatê me têr birîn. Bajarekî weke Heskîfê wê di bin avê de bimîne, ma gelo xema kî ye? Daristan li welat têne sewitandin, ma gelo xema kî ye? Teyrik û tûlîrê welatê me têr qelandin, ma gelo xema kî ye? Ava çemê welatê me dibe weke kanalizasyona bajaran, ma gelo xema kî ye? Mirov dikare ji xwe bipirse, ma gelo emê ci bikin ji Kurdistaneke rûtmayı, genî, hişk û ziwa? Ji ber vê yekê, têkoşin divê pirralî be û hebûn û dewlemdîya welatê me bi hemû awiyî bê parastin.

Heger hemû problem li benda rizgariya welat bimînin, wê roja rizgariyê, welatê me ji mirovên xwe bireve! Welatê me wê bi zimanekî xweş ji me re bibêje; "Ma hûn evqas bê aqil bûn!"

XAÇEPIRS

Çeperast: 1-Navê pêxemberê agirrestan. Di wêne de tê dîtin (Wêne temsilî ye)/ Jindarên yekhucra 2-Amûreke muzikê ku bi dest tê lêdan û ji çerm û tarê hatiye çêkirin, bi pirranî ji derwêş lêdixin/ Elî 3-Sembola Nikelê/ Jehra çıxarê 4-Hêz, taqet/ Kaxeba ku xwe-dîtiya avahî û arazî nîşan dide 5-Ava ne şêlî/ Rewirên firoke 6-Wajaw, naven-da belavkirina av û ceryanê/ Sembola Neonê 7-Aşîkar 8-Nav û deng/ Sewt, deng 9-Plaqa Tûnisê/ Vînî 10-Cihê hêrandina genim û dan/ Sifir, tune Serejêr: 1-Pirtûka, Zerdeşt pêxember 2-Navekî mîran/ Îrade 3-Sembola Rûbîdûmê/ Mijane, parçeyek ji haletê cotkîrinê 4-Beyanname, daxuyanî/ Kar 5-Rêxistina navneteweyî ya parastina mafîn zarokan/ Agir 6-Pêlav, sol/ Fesad 7-Eko, belavbûna deng/ Pis, kotî 8-Plaqa Misirê/ Nexweşînek, ta, sitma 9-Şepe 10-Wekok 11-Sembola Îridîûmê/ Ling 12-Muqades, mubarek

Amadekar: Rasto Zîlanî



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

Çeperast: 1-Haco Axa/ Papa 2-Efendi/ Dojeh 3-Lençe/ Kaliti 4-IRA/ Mîad/ Toz 5-Sine/ Tr/ Çete 6-E-nîşk/ Ma 7-Qefes 8-Oksijen 9-Ayinde 10-İmsak/ În Serejêr: 1-Helise/ Obî 2-Aferînek 3- Cenani/ SAS 4-Onc/ Eşqiya 5-Adem/ Kejik 6-Xî/ İt/ Fen 7-Karmendi 8-Dad/ As/ En 9-Pol 10-Ajite 11-Petot 12-A-hize

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tîriyê û li derive: Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiyat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bisînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercen abonetiyê:

6 meh	Li hundir
12 meh	120.000
	60 DM
	120 DM

Kerê ji pîrî ziriyayî

Zilamek hebû, kerê wî êdî pirr pîr bûbû. Ji barlêkirinê re nedibû. Rojek ji rojan xwediyê kerê ji xwe re hizirî. Li ser rewşa kerê xwe yê pîr bê ci bike. Xwediyê kerê qerarê xwe da û ji xwe re got: "EZ êdî nikarim vî kerê pîr xwedî bikim. Pûta ku ez bîdimê dê tev beredayî here. Nikare bar jî ragire. Guneh e, ez wî nakuji jî. Hema ez dê wî berdim çolê. Anglo ez dê wî aza bikim."

Xwediyê kerê rabû kerê xwe aza kir. Berî çolê da. Kerê me yî pîr jî, ji xwe re li çol û pesaran bi serberdayî geriya û çeriya. Di vê navê de ji xwe re hevalek jî dît. Hevalê wî jî gur bû. Kerê pîr pirî ku çeriyanabû û bi serbestî geriyabû xurt û qelew bûbû. Bûbû mîna kerekî ciwan. Ji rewşa xwe ya berê derketibû ketibû rewşike din. Xwediyê kerê ew bidîta jî,

kerê xwe nas nedikir.

Hevaltiya kerê pîr û gur pirr bi pêş ve çûbû. Ji hevûdin qet venediqetiyen. Tevî hev digeriyan. Rojekê, ker û gur dîsa ji xwe re digerin û diçêrin. Kerê me hingî ji nava xwe têr bûye tu tişî li ber pozê xwe nabîne. Ji nava xwe pirr ewle ye. Ker ji têrxwarin û kêfan nizane bê ci bike. Ker ji gur re dibêje: "Bi Xwedê zira min tê, ez dê bizirim."

Gur: "Nebî nebî tu bîzî. Rê gelek nêzî me ye. Bi Xwedê kî di rê de here û dengê zirîna te here wan, dê werin te bibin û bixine binê bar. Ez bim tu nazîrî."

Kerê me yê pîr li ser vê yekê dev ji zira xwe berdide û bi gotina gurê hevalê xwe dike.

Demek bi şûn ve, dîsa kerê pîr di cihê xwe de natebite. Xwest ku bizire. Her çiqas gotinê gur di serê kerê pîr de çûbûn û heq kiri-


bû jî dîsa ji gur re got: "Birakê gur bi Xwedê ez dikim nakim xwe ranagirim, xwestina min a zirandinê nahêle ku ez bitebitim. Ez dê bizirim. Lo ci dibe bila bibe. Ben di ku de zirav be, bila di wê derê de blaqtete."

Gur: "De tuzanî. Min ji te re got, rê nêzî me ye. Rêwî tê de diçin û tê."

Kerê pîr bi gotina gur nekir. Da lotik û çindikan. Moz kir. Zîtikan avêt. Ker tor û bor bûbû. Kes nakaribû ew bida na sekinandin.

Kerê me dest bi zirînê kir. Bi zirîna xwe re di nava mîrgê de çû vî serî û wî serî. Mirov di got qey moz pê veda-ne. Dêhn û har bûbû.

Di rê de yekî rêwî bi zirîna kerê hesiya, çavê rêwî bi kerê serberdayî ket. Dêhn û bala xwe dayê ku, ci kerekî ye. Têrxwar, xurt û qelew e. Rêwî ji xwe re got:



"Wele ev ker ji min kirî beredayî ye. Ez dê wî ji xwe re biqefêlim. Ji bo bar pirr hêja ye."

Rêwî ji bo qefaltina kerê pîr i beredayî, bi pey kerê ket. Ha vir de ha wir de, bi ci kul û derdan be, kerê di-qefêle. Kindir diavejê stûyê kerê û ji xwe re dibe.

Kerê me yî bê eqil jî bi zirîna xwe tê girtin. Ji nû ve dikeve binê bar.

Ker, ji ber ku bi serê xwe bû, têr diçêriya, dixwar û digeriya, kesî pê dernedixist ku pîr e û ji bar re nabe. Ker hingî ku xurt dixuyiya zêdeyî hêza wî bar lê dikir, xwediyê wî yê nû.

Di demeke kin û kurt de ker ji ber giraniya bar cihimî.

Belê zirîna wî bû sedemê mirina wî.

Berhevkar:
Zana Farqînî

TİŞTONEK

Ker zîrî pişkûl (mîşkûl) firî (tiving)

Sênîk mast li cihek (zevî) rast. (heyv)

Şeq şeqî dîwar peqî (bêvil, poz)

Gwîniyê di qûna latê de (rih, riha zilaman)

Xîşt û mişt li dera han hîst (melkes)

Tıştekî min heye jî her tıştî re divê (nav)

Ji min filîfî li te xebitî (kêç)

Şilo milo kete qulo (dêwl û çal)

Bin ferş tije godt (neynok)

Li ser destan dişemite dikeve çav dişewite (sabûn)

Qesra spî bê derî (hêk)

Qotîka bê dev û derman navê bê tu zeman (tîrb, mezel)

Tıştekî min heye bi rê de diçê neşsan dike (şekal, sol pêlaw)

Qasîmê qûn xwar çû serê darê, dar kire xwar (das)

Xerâbiya wê nîn e lê dixin bi pihînan (gok)

Dimeşim dimeşe, disekinim disekine (sî)

Li yekî dikeve dibore xuya nake dizûre (ba)

Du kaniyêñ gilover ava behrê jê te xwar (çav)

Tıştekî min heye tıştone ye gûyê wê li devê te ye (mêşa hingiv)

Şeş ben û benik du nan û kutilkek (mêzîn û weqî)

Ji darê ye, ji mîyê ye û ji şikêrê ye (mêzîn û weqî)

Şîva tîrê li guherê (mar)

Her hemo li ber çemo (kûsî, kîso)

Pişkok reş fîstan sor xeftan kesk (zebeş)

Kofiya xezalê tûtiya newalê

(heyv)

Gayê kejo di hewa re diajo (firok, balefir, teyare)

Oda şîşî sîh û du feqî lê rûnişî (dev û diran)

Qûnik di erdê de, noq di kerê de, serî di dê de (genim, dexil)

Bexçika tije çek û meke ji Xwedê pê ve tu kes nikare ve

ke (pîreka bi kar, pîreka li halkî)

Tıştekî min heye sor e ne sêv e, tîrî heye ne mişk e, nav spî ye ne penêr e (silk)

Qesir ji godt, derence ji hesin (hesp û zengo)

Ji hesin û ji kevir e çiqas di xwe têr nabe (aş)

Du qûlê nabiya, du qûlê roviya aşik di bin de geriya (çav, bêvil, dev)

Şemûna du qûna (gundor, bangor)

Dar ber darê, her aîlikî sax da ber, her şax fersek li ser (dest, tilî û neynok)

Dareke min heye bi duwaz-deh şaxî her şaxekî bi sîh çêlikî (sal, heyv û roj)

Ho dibêjim tefşo dibêjim. Bi nav dikim ji te re nabêjim (ga û taşo)

Hanye manye ferşê ser devê kaniya, rê nade aşvaniya (qeşa)

Sindirok li ser sindirokê, mefte li destê bûkê (destar)

Tıştekî min heye heta lapiq godt nekeve dev nameşe (ling, pî û şekal)

Bi şev cêrî bi roj xatûn e (ni-vîn)

Tanûra him himî tije nanê genimî (dev û diran)

Newalek kur tijê zixûr (bixûr) (esman û stêrik)

Celal

EYŞE ŞAN

*'Rê li ber
muzîka
Kurdî
vedike'*

İzmir, Welat- Eyşe Şan ji demeke dirêj ve ye ku dengbêjiyê dike. Ji çar aliye Kurdistanê ve ji qaset û bernameyên radyoyan ên bi Kurmancî tê nasîn.

Piştî derbeya leşkerî ya sala 1980'yi deng û hîsên wê ji nehatbihîstîn. Em lê geriyan û me xwest ji bo xwendevanê rojnameyê pê re hevpeyvînekê bikin. Eyşe Şan kî ye, niha çi dike, ji bo pêşerojê li ser muzîka Kurdî dixwaze çi bike, li vêguherînên civaka me, bi çi çavî dinêre û hwd. Pirsan me jê pirsi.

Em vê hevpeyvînê li jêrê pêşkêşî xwendevanen xwe dikin.

Birêz Eyşe Şan, tu dikarı xwe bi me bidî nasîn? Malbata te ji ku ye?

Dayîka min ji Erzeromê, ji malbata Hacî Mûsa Begê ye. Bavê min ji Eşîra Cibrân e. Ez ji li Diyarbekir hatime dinê, li vir mezîn bûm, yanî zaroka Di-

ye kî muzîkê, min li Dilükê (Entab) dest bi dersên muzîkê kir. Dû re 2 salan di radyoya Dilükê de xebitîm.

We gote bavê min dengbêj bû. Tu stran, an helbesten wî yêni nivîsandî he-ne?

- Na. Tu berhemên wî destê me de nemane. Tenê helbestek min jiber kiribû û min wê helbestê di qaseteke xwe de xwend. Navê helbestê "Xirabo ye"

Ger mirov mercen (şerten) civaka Kurd bîne ber çavên xwe, ne hêsan e ku jineke Kurd dengbêjiyê bike. Di jiyan te ya dengbêjiyê de, weke ci astengî derketin pêşîya te?

- Belê, min gelek astengî ditin.

Weke ci?

- Beriya 15 salan, min li Wanê program amade dikir. Ji ber ku min tenê helbesten bi Kurdî dixwend, programa min

qedexê kirin û min ji, li ber vê qedexeyê nikaribû dengê xwe derxista. Dû re li Mûse û Erdîşê ji, qedexeyen wiha derxistin pêş me. Konseren min standin qeydê û birin Enquerê. Tevi dîtin ku ez propaganda nakim, dîsa ji, ji min re gotin, "Tu nikarî bi Kurdî bistî." Min li ber xwe da. Min got, "Li vî memleketî, bi İngîlîzî, Fransîzî, Almanî tê xwendin, ez ji bi Kurdî dixwînim." Lî ne-hiştin. Min ji, nikaribû bi serê xwe li hember wan derkevin. Min dev ji strandina bi Kurdî berda.

Li gorî ku em zanîn, hûn çûbûn başûrê Kurdistanê ji, we li wir bi çend h u n e r - m e n d e n Kurd re konser dabûn. Hûn dikarin qala geşta xwe û wan hûnermandan ji me re bikin?

- Belê, ez çûbûn başûrê Kurdistanê. Min li wir konseran dabû û ji bo radyoyê ji, program amade kiribû. Min li wir çend hunermendên Kurd ji nas kir. Mîna Gulbahar, M. Arifî Cîzrewî, İsa Berwarî, Tehsin Taha. Dû re, Tirkmenen herêmê ji, ez xwestim. Min ji bo wan ji progameke bi Tirkî amade kir. Li Erbilê ji konserrekê da.

We 25-30 sal berê ji, muzîka Kurdî digot. İro li piyasê an ji di nav NÇM (MKM)'ê de ji, muzîka Kurdî tê xwendin û amadekirin. Hûn dikarin ferqa di nav muzîka 30 sal berê û i-ro de ji me re bibejin?

- Gelek ferq heye. Berê kesî nikaribû li gor dilê xwe stranan bixwîne. İro, bi çi buhayî dibe bila bibe, herkes ya dilê xwe distire. Ev ji, ji muzîka me re, re vedike.

Weke xuya dibe, li ser we ji, gelek astengî pêk hatine. Gelo ci jê xerabtir e ku mirov nikaribe bi zimanê xwe bistire?

- Ev tiş, gelek xerab e. Em li vî welati, di xizmetkirinê de wekhev in, lê di parvekirina nîmetan de wekhevî nîn e.

İro herkes dikare bi zimanê xwe bistre. Hûn vê bi ci ve girê didin?

- Têkoşîna wê tê dayîn. Ev berhemên têkoşînê ne.

Baş e, ev li xweşa we dicê?

- Belê, ez bi vê yekê bexte-

war im.

Niha li Stenbolê, bi navê Unkapani cihek heye. Ev der cihê bazara muzikê ye. Hûn vê bazara muzikê çawa dinrixînin? Li vê bazarê, her yek bi awayekî, li muzîka Kurdî dimije. Hûn van kesan çawa dibinîn?

- Li gorî min, ev rewşa han gelekk ne baş e. Kî radibe û li gorê xwe şiroveyekê tîne ji mu-

zîka Kurdî re.

Emre van ke-san ne dirêj e. Divê huner-mend berdarî be. Naxwe her kî dibe bila bibe, dema mu-zîkê bîne û bi awayê erebes-kî şirove bike, dê di nav demê de, win-dâ bibe.

Em bibejin ku hin mafan me yêni çandî da-ne me; dê wê demê ev tevlîhevî winda bi-bin?

- Bi dîtina min, bi otonomi-yeke çandî, dê ev tevlîhevî ji holê rabin.

Hûn MKM'ê çawa dinir-xînin?

- MKM, saziyeke bi fêde ye. Xebatên wê min kêfxwes dikin. Bi rastî ji saziyeke pirr hêja ye.

Weke hunermendekê, hûn difikirin ku tevî xe-batê MKM'ê bibin?

- Teklîfek wiha li min neha-te kirin. Naxwe difikirim. Lew-re, Unkapani, bi salan ez mêtîm. Ger saziyeke hebe ku li me xwedî derkeve, em dê lê xwedî derkevin. Ger MKM ber-jewendiyen me biparêze, emê ji, wê ji xebatên xwe mehrûm nehelin.

Eyşe Şan di pêşeroja jiyan-a xwe de dixwaze ci bike?

- Ez difikirim ku di warê mü-zîkê de, karên bi fêdetir bikim.

Tu difikiri ku muzîka ra-dikaltir çebiki?

- Divê ez di nav wê jiyan-a ra-dikal de bijim.

Hûn difikirin ku biçin Kurdistanê û li wirbijin?

- Ji ber ku piyasa muzîkê li Stenbolê ye, divê ez nêzî Stenbolê bijim.

Tu muzîka Kurdî distri, ger tu li Kurdistanê bijiy ne çêtir e?

- Weke min got ku piyase li Stenbolê ye. Ne ku ez ji bo re-hetiya xwe dibejim.

Tu mesaja we ji gelê Kurd re heye?

- Xwedê gelê me serfiraz bi-ke.